

ESKATOLOJÎ Û JIYANA PIŞTÎ-MIRINÊ: DI KURDÎ DE NUMÛNEYÊN METNÊN ESKATOLOJÎK Û NÛ-VARYANTEKE “BEYTA SEKERATÊ”

ESCHATOLOGY AND AFTERLIFE:
ESCHATOLOGICAL EXAMPLES IN KURDISH TEXTS AND
THE NEW VERSIONS OF “BEYTA SEKERATÊ”

Ayhan TEK*

Genre/Cure:

Research Article/ Gotara
Lêkolînî

Received/ Hatîn:

12/12/2021

Accepted/ Pejirandin:

25/12/2021

Published/ Weşandin:

28/12/2021

Pages/ Rûpel:

15-44

ORCID:

0000-0002-9862-6938

Plagiarism/Întihal:

This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website./ Ev gotar herî kêm ji aliyê 2 hakeman ve hatiye nixandî û di malpera întihalê ithenticate re hatiye derbaskirin.

* Doç, Dr., Zanîngeha Muş Alparslanê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Muş Alparslan University, Department of Kurdish Language and Literature, Muş, Turkey, ayhangeveri@gmail.com

PUXTE:

Mirin, di tarîxa mirovahiye de ji qadên cuda yê hunerê heta felsefe û dînan, bûye tema û mijareke girîng. Ji ber ku ew ji têgeheştina insanen der bûye, di encama hewlên ji bo fêmkirina mirinê, lîteraturên curbicur pêk hatine. Bi taybet hin qadên wek metafîzîk û teolojiyê, li pey sîrên mirinê ketine û hindekan li gor xwe bersivên wê mu’emmayê dane. Ji ber wê jî ji metnên teolojiyê heta metnên felsefî û edebî lîteratureke berfirek heta îro hatiye. Bi berhevbûna wan metnan û xebatên li ser wan jî qada eskatolojiyê pêş ketiye. Di nava wan metnên balkêş yê eskatolojiyê de rêwîngiyên wek “seferên metafîzîk” yan jî “çûna alema din” û “seyahetên ber bi alema piştî mirinê” derdikevine pêş ku ev seferene, mijara sereke ya vê xebatê ne. Ji “destana Gilgamesh”ê û *Ardavîrafnameya* ku mijara wê sefera muxekî/ezîzekî Zerdeştî ya bo Cennet û Cehenemê heta “mîracname”yên ku derheq çûna Muhemmed Pêxember ya bo Cennet û Cehenemê, herwisa ji “destana Cincime Siltan” heta *Komediya Ilahiya Dante*, paşxaneyêke eskatolojîk çêbûye. Helbet ew paşxane digel mîtos û rîtuêlên dewlemend hatiye dariştin ku di çandên cuda de ew bi rêya (cih)guhurîna motif, mîtos û rîtuêlan ve kûrtir û berbelavtir bûye. Di vê çarçoveyê de di çanda Kurdan de jî şax û numûneyên wan mît û rîtuêlan têne dîtin ku ew wek metnên serbixwe jî hatine nivîsîn. Di nava wan de jî “destana Cincime Siltan” û varyantên cuda yê “Beyta Qiyametê” û “Beyta Sekeratê” wek numûneyên balkêş in ku di nava wê paşxaneyê eskatolojîk de derdikevine pêş. Di vê xebatê de numûneyên Kurdî yê wekî *Nehcul-Enama Mela Xelîlê Sêrtî*, *Rewdun-Ne’îma Şêx Ebdurrehmanê Aqtepi*, *Sirû’l-Mehşera Feqe Reşîd*, varyantên cuda yê *Cincime Siltanê* û berhema Mela Yasîn Yusrî *Bexçeyê Jiyana Piştî Mirinê* dê wek metnên eskatolojîk bêne nixandî. Herwisa metnê “Beyta Sekeratê” ya nehatî weşandinê dê bi muqayeseya ligel varyantên di ve

bête dayîn û analîza wê dê bête kirin. Bi vî awayê dê literatura Kurdî ya eskatolojiyê bête nasîn û metnên wê lîteraturê bêne tehlîlîkirin.

Peyvên Sereke: eskatolojî, mirin, Edebiyata Kurdî, qiyamet, Beyta Sekeratê.

ABSTRACT:

From different fields of art to philosophy and religion, death has been an important subject in human history. Since it is beyond human understanding, different literatures have emerged for the sake of its comprehension. Particularly, in the field of metaphysics and theology, the secrets of death have been pursued, some also attempted to provide answers for this mystery. Therefore, a wide range of theological, philosophical, and literal text have survived to the present day. The collection of these texts and the studies on them contributed to the development of eschatology. Among the eschatological texts, subjects such as “metaphysical journey”, “traveling to another realm” and “journey to afterlife” come fore which also form the main subject of this study. A rich background has been formed with a large amount of eschatological literature, such as *The Epic of Gilgamesh*, tales about Prophet Mohammed’s ascension and his journey to Heaven and Hell, *Ardavirafname* which describes the journey of a Zoroastrian saint to Heaven and Hell, the epic of *Cimcime Sultan*, “The Divine Comedy” of Dante, and etc. Indeed, this background has been merged with myths and rituals, and by going through the changes in the motifs, myths, and rituals of different cultures, it became deeper and wider. In this regard, in Kurdish literature, it is also possible to observe such myths and rituals which they have also been written as independent texts. Among them, the epic of *Cimcime Sultan*, the different versions of “*Beyta Qiyametê*” and “*Beyta Sekeratê*” are outstanding examples, which manifest themselves in this eschatological background. In this study, the Kurdish examples, such as Feqe Reşîd’s *Sirru’l-Mehşer*, different versions of *Cimcime Sultan*, Mela Yasin Yusri’s *Bexçeya Jiyana Piştî Mirinê* will be evaluated as eschatological works. Also, the unpublished texts of “*Beyta Sekeratê*” will be assessed in comparison to the other versions of it. Thus, the Kurdish eschatological literature will be introduced and its texts will be analyzed.

Key Words: Eschatology, Death, Kurdish Literature, Apocalypse, Beyta Sekeratê.

1. DESTPÊK:

ESKATOLOJÎ, MIRIN Û SEFERÊN BO CIHANA PIŞTÎ MIRINÊ

Eskatolojî, qadeke teolojîk e ku ji mîtolojî û baweriyên dînî istifade diket û li pey pîrsa dawîya dinyayê ye ku ka dinya dê çawa xirab bibit, yanî dê qiyamet çawa rabit. Bi vî rengî bo eskatolojiyê, dawîbûna jiyana dinyayê û xirabbûna dinyayê mijarên sereke ne. Ji ber ku li ser dawîbûna heyata dinyayê disekine, di eskatolojiyê de xalên sereke yên wek qiyamet, têgeheştin û haziriya alema dî û Cennet-Cehennemê derdikevine pêşiya me. Herwiha eskatolojî, girêdayê bi fîkra “axir-zemanê” ve zemîneke metafîzîk pêk tînit. Loma di metnên dînî û edebî de li ser qiyamet, Cennet û Cehennemê muktesebatek çêbûye. Yanî ew paşxane ji çand û baweriyên cuda pêhatiye ku di wê de hizrên kolektîf yên ji sedan salan dariştî peyda dibin. Ji ber wê jî di çandên cuda de mît, mîtos û motîfên nêzik hev tene dîtin.

Fikra “dawî”bûnê, rabûna qiyametê, “axiriya zemanî” û baweriyên bi vî şiklî bala insanan zêdetir kêşaye ser mirin û alema piştî mirinê. Loma di gelek dînan de dijarî/tirs û heqîqeta mirinê digel haziriya mirin û piştî mirinê ve têtê ravekirin. Herwisa li dor mîtên “dawî” û “jiyana/alemeke nû” hem seferên wek mi‘racê çêbûne hem jî li dor mirinê û şandina miriyan ji vê dinyayê, rîtuelên mîtîk/dînî pêk hatine. Ji aliyê dî ve, di eskatolojiya Islamî de “dawî”bûna dinyayê girêdayê temambûna pêwendiya di navbera esman û erdî de ye jî. Lewra temambûna wehyê û girtina deriyê pêxembertiyê, fikra “ber bi dawîbûnê ve” ye. Lewra Pêxemberê Islamê “xatemul-enbiya” ye yanî pêxemberê dawî ye. Herwisa di nêrîna Islamî de çavkaniyên dînên dî yên beriya Islamê de jî hatina Muhemmed Pêxemberî di heman kontekstê de hatine vegotina. Ji ber wê jî di bingeha teolojiya Islamî de tesîra “dawî”bûnê di gelek mijaran de têtê dîtin. Çunku “dîn temam bûye” û ya mayî jî nêzîkbûna qiyametê ye û ji bo qiyametê jî “tenê ‘elametên mezin mane.” Di encama wê de jî mîtosên “qehramanên xilasker” jî (yên wek Mehdî, Xizr û Îsa...) di nava metnên eskatolojiyê de xuya dikin.

Mîtosên eskatolojiyê, exleb li ser tunebûna alemê ya ji ber tofan, erdhej yan jî teqdîreke Xwedayî (bûyerek wekî qiyametê) û di encama wê de jî vejîna bi halekî nû/paqî radiwestin. Li gor wan mîtosan, pêşiyê encameke kaotîk/dijwar û paşê jî vejîneke bi mizgînî pêk têt (Batuk 2001: 24). Çawa ku di eskatolojiya Mesîhiyan de jinûvehatina (zuhûra) Îsa Pêxember heye, di ya Islamê de jî qiyamet û jiyan nû ya bi vejîna axretê heye. Jixwe di kozmogoniya Islamê de jiyan vê alema rastî, wekî xewnekê ye û axret warê esasî ye. Herwisa di etimolojiya “qiyametê” de jî “rabûn”a li ser piyan (qiyam) heye, yanî ji halê razayî yê ber bi halê hişyariyê. Ji ber wê, Musliman di qebrî de yan jî di vê alemê de wek xewekê de bin, radibin/li axretê hişyar dibin. Loma ji bo axretê te’bîra “ba’su be’del-mewt” têtê gotin ku me’naya wê “hişyarbûna piştî mirinê” ye. Wekî ku di mîtosa tofanê de, alem hemî di bin avê de dimînit û ji gemariyan xilas û “paqî” dibit. Zeman û alem ji nû ve bi şiklikekî nû (bêguneh) peyda dibin.

Mirin tekane rêwîngiya/sefera insanî ye ya ji bo alema metafîzîk. Di gelek baweriyên de ew alem (yan jî Xwedê bi xwe) li miqameke jor e. Ew cih jî ya “esman” e, ya “çiya” ye yan jî “serê daran” e. Rêwîngiya metafîzîk jî hilkêşana/jêhelbûna ber bi jor ve ye.¹ Loma mîta jêhelbûnê peyda bûye û di encama wê de jî di baweriyên cuda de rîtên wekhev belav bûne. Digel wê jî metaforên wekî “nerdivan/pêlekan”, “bendîkê jêhelbûnê” û “dar” têtê dîtin (Eliade 2003: 116; Gennep 1906: 404-423; Özbek Arslan 2019: 422). Ew texeyyûla dînî/mîtîk, bi rêya sembolan ve hatiye ravekirin û di encama wê de jî di navbera dinyaya fîzîkî û alema metafîzîk de têtîkîyê hatiye sazîkirin û ji erdî ber bi esman seferên metafîzîk çêbûne. Bi vî şiklî wek motîfeke hevpar “motîfa jêhelbûnê” derketiye pêş. Di vê çarçoveyê de wekî ku di serpêhatiya Ye’qûb Pêxemberî de têtê dîtin, motîfa bêhtir derketiye pêş nerdivan e. Lewra jêhelbûna wî bi nerdivanê (Jacob’s Ladder) çêbûye. Herwekî ku di mîtosan—û neqla di *Incîlê* û *Tewratê*—de diborit, Ye’qûb Pêxember ji welatê xwe Beer-Şevayê derdikevit û ber bi Herranê ve diçit. Ew li Bethelê bêhna xwe vedidit û serê xwe datînite ser berekî. Piştê wê, xew re diçit û xewnekê dibînit. Di xewnê de nerdivanekê dibînit ku milyaket jêhel diçin û têtê xwarê. Ew jî bi nerdivanê jêhel diçit. Piştî ku digehe jorê, ew Xweda dibîne (li gor hin vegotinan li gel Xwedê—yan jî ligel milyaket Mikailî—guleşê digrît) û Xwedê mizgîniya neslekê didetê û axa li ser razaye jî didete wî û (Benî Israîliyan/Cihûyan) qewmê wî (*Bible*, Genesis 28: 10-20).²

1 - Di teolojiya Islamê de Xweda “Te’ala” ye û sifeteke wî jî “mute’al” e yanî yê ku ‘ela/bilind/pîroz...

2 - Ji bo zêdetir agahiyan bnr: (Harman 2013).



Jacob's Ladder 1490, by French School,
Musée du Petit Palais, Avignon, France

Mîtosa jêhelbûnê yanî mi'rac, wek seferên metafîzîk di metnên dînî/edebî de hatine dubarekirin. Mirov dikare bibêjît ku mîtosên cuda yên li dor seferên metafîzîk, di nava eskatolojiya Islamî de guherîne û ji nû ve hatine saz kirin. Bi vî şiklî hevpariyê xurt di navbera wan mîtosan de çêbûye. Bo numûne di çanda Muslimanan de pîreya Siratê "ji mû ziravtir û ji şûr tîjtir" e ku li gor Nejad Keyayî, bîngeha vê teşbîhê diçite heta *Ardavîrafnameyê* (Özbek Arslan 2019: 425). Navê pîra Siratê di *Qur'anê* de derbas nabît, lê ew [pîra Çînvadê] û fikra vejîna axretê, Cennet û Cehennem ji Zerdeştîyê derbasê Cihûtî û Muslimantiyê bûne (Çiğ 2005: 23). Herwisa di bawerîya Islamê de yek ji şertên îmanê jî "bawerîpê'nana axretê" ye. Yanî bawerîya li ser alema dîn, xaleke esasî ye. Ji ber wê jî jiyana axretê, wek rastiyeke qet'î tete zanîn ku di metnên dînî de, çûna Cennet

û Cehennemê ya piştî vejînê/hişyarbûnê, dîtina rûyê Xwedê yan jî xalên wek şefa'eta Muhemmed Pêxemberî û piştgiriya wî ji bo ummeta xwe bê-şik têne vegotin. Hetta ev bawerî di nav Muslimanan de evqas bi hêz e ku ew di jiyana rojane de gelek hesab û çareserîya kêşeyan dihêlin bo axretê. Lewra li wê alemê “mîzan” heye û Xwedê herkesê digehînite heqê xwe û edalet cîbicî dibit. Ji aliyê dî ve ev bawerîya di vê çarçoveyê de ne tenê di Islamê de heye. Di baweriyên cuda yên beriya Islamê de jî heman bawerî hebûn ku di encama wê de jî mîta xilaskerekên eskatolojîk derdikevite der. Çawa ku di bawerîya Muslimanan de zuhûra “Mehdî” heye herwisa di Cihûtî û Xirîstiyaniyê de “Mesîh”, di Zerdeştîyê de “Saoşyant” û di Sabîtiyê de jî “Prašai Sîva” xilaskerê eskatolojîk e (Batuk 2001: 24).

Di mîstîsîzma Islamî de xilasker gelek caran mirin bi xwe ye. Lewra mirin dawîbûnê zêdetir, xilasbûna ji halê berzexê ye. Çunku hebûna/alema eslî, dîdara yarê ye û ev alema maddî jî cihê mişextiyê û warê xerîbiyê ye. Loma di vê çandê de mirin, xilasî (nihayet) nîne, xilasiya (necata) ji xerîbiyê ye. Di vê çarçoveyê de Molla Sadra (1571?-1641) di berhema xwe *el-Esfarûl-Erbe'ayê* de “hebûn”ê wek metafora rêwîngiyê dibînit. Jixwe kelîmeya ewil ya navê kitêba wî jî “efser” û ew pirjimariya “sefer”ê ye. Di vê çarçoveyê de, *el-Esfarûl-Erbe'a* behsa çar seferan diket. Di rêwîngiyên (sulûkên) hebûnî de sefera yekem “hereketa cewherî” ye ku di vê rêwîngêyê de bi rêya “idrak/hiş” haydarê hebûnê (mimkin û mewcudiyetê) dibin. Rêwîngiya duyem—bi zimanê tesewwûfê—“ji Xwedê ber bi Xwedê” ye û rêwîngiya sêyem “digel Xwedê sefera ber bi kainatê” ye. Rêwîngiya dawî jî uxrewî ye ku “digel Xwedê ber bi Xwedê ye” ku ew jî temsîla jiyana piştî mirinê diket (Açıkgeç 1995: 375). Herwisa divê metnên metaforîk yên wekî çîroka “sîmurg”ê ya Ferîduddîn ‘Ettar (mr. 1221) ya ku sefera ji heft newalan ber bi Qafê, yan jî fikrên Mewlana Celaleddînê Romî (mr. 1273) jî di vê çarçoveyê de bibînin ku mîstîkên Musliman, mirin wek “geheştin” û “wuslet” dîtine. Divê wê jî bibêjin ku di *Qur'anê* de bi dehan ayet li ser qiyamet û teswîrên wê û roja axretê cih digirin³ û hêbetek hedîs jî li ser qiyametê hatine riwayetkirin.

Di çanda Muslimanan de ji aliyê rîtuêlên cenaze, qebr, girêdana şînê û ‘edetên serxweşîyan ve jî paşxaneyêke berfireh tête dîtîn. Di vê çarçoveyê de jî ji bo ku rûhên kesên mirî, piştîmirinê jî aram bimînin, li ser bingeha nerîteke qedîm ayîn têne tertîb-kin. Bo numûne ‘edetê telqînê ku tête me'naya şandina mirî bi şiklê “bêguneh” ji bo “aliyê din” bi serê xwe rîtuêleke seyr e. Herwisa pêkînanana xêr û sedeqeyan ji bo rûhên kesên mirî ya piştî mirina wan jî ji aliyekê ve girêdayî bawerîya axretê bit, ji aliyekê ve jî peywendiyêke di navbera vê dinya û dinyaya dî ye.

Di edebiyata dînî de lîteratureke berfireh li ser mirinê hatiye terxankirin. Herwisa di berhemên hunerî û felsefî de ew mijar bûye ilhameke mezin. Di edebiyata Kurdî de jî numûneyên bi vî rengî ber bi çav in. Ew numûne, zêdetir ew in ku “mirin” rasterast wek fonekê bi kar îname. Lê digel wê, çend numûneyên balkêş yên ku yekser li ser “de-ma-mirinê” û “piştî-mirinê” hatine nivîsîn hene ku ev lêkolîna me jî li ser yek ji wan numûneyan e. Ev berhem bi navê “Beyta Sekeratê” di nava civateke teng de bête zanîn jî li Bakur hêj wek metneke kamil nehatiye belavkirin û qasê agahiya me, xebatek jî li ser nehatiye kirin. Wêca di vê xebatê de em dê metnê veguhastî yê “Beyta Sekeratê” belav bikin û bidene nasîn.

3 - Di *Qur'anê* de navê hin sûreyan rasterast li ser meseleyên qiyamet û jiyana piştî mirinê ne: 7. E'raf; 17. Îsra; 59. Heşr; 70. Me'arîc; 75. Qiyamet û 81. Tekwîr.

Bi vî şiklî ev lêkolîna me dê ji du qîsman pêk bêt ku di serî de divêt em behsa zemînê teorîk û lîteratura giştî ya mîtîk/edebî bikin. Paşê jî mînakên di nav edebiyata Kurdî de pêşkêş bikin. Lê pêşiyê divê îzaha du xalan bikin: yek, em dê di vê xebatê de, eskatolojiyê di me'nayeke firehtir de şîrove bikin. Lewra eskatoloji tenê li ser dawîya dinyayê radiwestît, lê li dor nêrînên qiyametê/axretê, em dê vê têgehê hin caran wek "alema piştîmirinê/metafizîk" jî bikarbînin. Lewra ew dê imkanê bidet ku em destan û metnên wek mi'racnameyan çêtir tehlîl bikin. Xala duyem, bo fêmkirina bîngeha eskatolojîk/mîtîk, em çend metnên—yên bi nezera me girîng in—bidene nasîn, da ku zemînê vê qadê û motîvasyona metnên Kurdî bête zanîn.

2. METNÊN BINYADGER YÊN LI DOR ESKATOLOJIYÊ

Di navbera mîtoloji û teolojiyê de têkiliyên qahîm hene ku, ew herdu qad hin caran ji ber çavkaniyên hevpar têkil hev jî dibin. Ji ber wê jî tesîreke mezin ya van herdu qadan li ser metnên dînî û edebî çêbûye û li ser seferên alema dî berhem hatine nivîsîn. Di encama wê de jî temaya mirinê di nava serpêhatiyên seferên bo alema miriyan de hatiye vegotin. Bo numûne *Rîsaletul-Xufrana* Ebul-'ala el-Me'arrî (mr. 1057), *Seyrul-'ibad ilel-Me'ada* Sena'iyê Xeznewî (mr. 1130), *Mantiqul-Teyra* Ferîduddîn 'Ettar û *Mîsbahul-Erwa-ha* Ewhaduddînê Kirmanî (mr. 1238) di çanda Îranê de çend metnên girîng yên li dor vê mijarê ne. Herwisa di Tirkî de ji mewlîdnameyan heta *Muhemmediyyeya* Yazıcıoğlu Mehmed (mr. 1451) û *Envârul-Âşîkîna* Ahmed Bîcân (mr. 1454) li ser mijarên eskatolojî û kozmogoniya Islamî berhem hatine nivîsîn. Bi vî şiklî di nav edebiyata dînî ya Rojhilata Navîn de berhem li dor mijarên eskatolojî û jiyana piştî mirinê hatine nivîsîn. Wek me li jorê jî gotî, dixwazîn behsa çend mînakên sereke yên rasterast li ser seferên alema dî hatine nivîsîn bikin.

2.1. Destana Gilgameşê

Destana Gilgameşê ku digehe serdema şarîstaniya Sumeriyan, yek ji metnên bîngehîn yên mîtolojiya Mezopotamyayê/Babilî ye. Wek metneke edebî xalên Gilgameşê yên li dor alema dî hene. Lewra di vê destanê de jî seferên bo alemên miriyan hene. Heta taybetiyê vê metnê ew e ku seferên du-alî têne dîtin. Yanî di metnê dî yên li dor mîtosa jêhelbûnê de exleb rêwîngiyên berjor peyda dibin, yanî çûna ber esmanan heye. Lê di Gilgameşê de hem esman hene wek cihên xwedawendan hem jî wek teswîra Cehennemê û cihê "nemiran" binê erdê heye. Di zimanê Sumerî de ji bo wê alema binê erdê, kelîme ya "kur" dihate bikarînan ku ew herwisa dihate wateyên "çiya" yan jî "xerîbistan/welatê biyani" (Sandars 1973: 30). Lê ew "kur" alema binê erdê bû ku vegeirîna ji wê nebû. Ew "kur", her ew "Şeol" a di *Tewratê* de, "Hedes" a bi Yewnanî, Cehennema di *Incîlê* de û fikra axretê ya di Islamê de ye (Çiğ 2005: 23). Bi vî şiklî ev "kur" wek me'na nêzîkê "gor"/"kor"/"kûr" a Kurdî ye.

Xala vê berhemê ya ji aliyê vê xebata me ve girîng xuya dike, seferên alema dî ne. Lehengê sereke Gilgameş, kerbê xwedawendan vediket û li ser wê jî ji bo kuştina wî bi navê Enkîdu kesek têtê rêkirin. Lê li Urukê gava Gilgameş û Enkîdu guleşê digrin û yekûdu têtê nabin, paşê dibine dostên hev. Xwedawendê bi navê Anu biryarê dide ku "yek ji wan divê bimire." Lê xwedawendê bi navê Şamaş têtê harîkariya wan, lê ew tenê dikare Gilgameşi rizgar bike. Paşê Enkîdu ji bo pêkînana karekî diçe alemên bin erdê, lê li wêderê asê dimîne. Lê paşê bi şiklekê ji kunekê/qulekê vedigere dinyayê û behsa alema binê erdê û dinyaya miriyan diket (bnr.: *Gilgameş Destan* 1973). Piştî vegeera Enkîdu, Gilgameş jê

dipirse ka te filan filan mirî çawa dîtin û rewşa wan çawa bû. Li ser pirsên bi vî şiklî, Enkîdu jî bo hevalê xwe Gilgamesî yek bi yek teswîra wan miriyan diket.

Di destana Gilgames de mijarên aidê alema dî, li ser sefera Enkîdu têne vegotin. Lê tiştê balkêş ev e ku di navbera destana Gilgames û metnên Islamî de—bi taybetî jî metnên wekî “Beyta Qiyametê” û “Beyta Sekeratê” de—li ser dijwarbûna ezaba binê erdê/ Cehennemê xalên nêzîk hev gelek in. Lewra çawa ku di metnên dînî de Musliman li hember ezaba Cehennemê têne hişyarkirin, Enkîdu jî wextê hevalê wî Gilgames pirsê alema dî diket wisa bersiva wî didet: “Hevalo, neşêm bibêjim, neşêm! Heke ez behsa tiştên min di binê erdê de dîtine bikim, divê tu birûnêy û bigirî. Û ez jî rûnê bigirîm (Gilgames Destanî 1998: 91).”

2.2. Avesta û Sefera Kerdîrê Zerdeştî

Baweriyên bi Cennet, Cehennem û ‘Erefê di metnên Îranî de bi şiklên cuda derbas dibin. Di nav metnên dînî yên aidê çanda kevin ya Îranê de numûneyên balkêş yên derheqê serpêhatiyên jiyana piştî mirinê cih digirin. Ji wan yek ya girîng jî *Avesta* ye. Lewra numûneyên alema dî, di *Avestayê* de di çarçoveya rêwîngiyên Zerdeşt yên metafîzîk de têne dîtin. Di hin beşên *Avestayê* de agahiyên muhim yên derheq teswîrên alema piştî mirinê têne dayîn. Bi taybetî beşên *Avestayê* yên hatine parastin de—wek “Vendîdad (19)” û “Hadokht (nesk 2-3)”ê—behsa jiyana piştî mirinê têtê kirin. Bi vî şiklî agahiyên derheqê alema piştî mirinê hatine dayîn, paşê di metnên cuda de şax dane. Bo numûne ew şax di metnên dînî yên Pehlewî wek *Mînu-yi Xired* (beş 1) û *Bundehişn-i Buzurg/Îranî* (beş 30) de derdikevine pêşiya me. Di beşa “Behmen-Yeşt”ê ya *Avestayê* de Zerdeşt bi xwe jî behs diket ku piştî Ahura Mazda “xired-i heme agahi” yanî “hikmeta giştî” didete wî, ew çawa li Cennet û Cehennemê geriyaye û li wêderê wî çawa çavdêriya sernivîştê insanan kiriye (Utas 1377: 311).

Di çanda Îranî ya beriya Islamiyete de jîbîlî serboriya Zerdeştî behsa du rêwîngiyên dî yên metafîzîk têne kirin. Ji wane yek, mi’raca Ardavîraf e ku em dê li jêr behsa wê bikin. Ya dî jî seyaheta ezîzê serdema Sasaniyan yê bi navê Kerdîr e. Kerdîr di wê desthilatdariyê de xwedanê meqamekî muhim bû û wî temsîla dînê wê serdemê dikir. Ji ber ku Kerdîr bi emrê Behramê Yekem (273-276) Manî idam diket û îbadetxaneyên Manîyan kavil dike, hem hêza dînê Zerdeştî berbelav dibit hem jî hêza wî ya şexsî xurttir dibit. Li gor agahiyên ku Utas dide, Kerdîr serpêhatiyên xwe yên rûhî/xeyalî dane qeydkirin. Wî di dawiya salên sedsala 3yan de dîtînen xwe li ser kevirên çar çiyayan bi şiklê çar kitabeyan (“seng-nivîşte”) dane nivîsîn (Utas 1377: 311). Ew kitabe li cihên bi navê “Neqş-i Receb”, “Ke’be-yi Zerdeştî”, “Ser-Meşhed” û “Neqş-i Rustem” in. Di van kitabeyan de Kerdîr didete zanîn ku ew di xizmeta xwedawendan de ye û xwedawendan jî ew gehandine meqamekî bilind. Herwisa wî xwastiye ku meqamên miriyan yên piştî mirinê bibîne. Ji bo wê, xwedawendan daxwaza wî bi cih îname da ku hem Kerdîr hem jî kesên ku serpêhatiyên wî dixwûnin di baweriyaya xwe de li ser sebatê bikin û li ser îmanê bimînin. Herwisa ew dibêje ku ji bo sefera alema din, ew ketiye haleke wek mirinê û paşê derbasê alema miriyan bûye. Ji aliyê dî ve di teswîrên Cehennem û Cennetê de ev kitabene ji aliyê hin mîtan ve numûneyên mîtosên pêşîn didin. Lewra di sefera Kerdîrê de hin xal hene ku ew di mîtosê mi’raca Islamî de jî derdikevine pêşiya me. Wek mînak gava Kerdîr li ser pireya Çînvadê ya li ser rûbarên sam yên Cehennemê hatiye danan derbas dibit ew wê pireyê bi şiklê “ji mû ziravtir û ji şûr tîjtir” pênase diket (Yıldırım 2019: 18-21).

2.3. Ardavîrafname

Ardavîrafname metneke girîng ya baweriya Zerdeştîyê ye ku bi zimanê Pehlewîya Sasani hatîye nivîsîn. Bîngeha vê metnê li ser seyaheta alema dî ye. Di vê berhemê de qaîdeyên dînê Zerdeştîyê/Mazdeîst, bi rêya seyahetê me'newî têne vegotin. Di *Ardavîrafnameyê* de serpêhatiya muxekî/ezîzekî Zerdeştî yê bi navê Ardavîraf têtê vegotin. Ev berheme ji 101 beşan pêk têt ku têde behsa amadekariya rêwîngiya Ardavîraf, teswîrkirina Cennet û 'Erefê paşê halê gunehkarên Cehennemê têtê kirin. Tarîxa nivîsîna rasteqîn ya wê metna Pehlewî diyar nîne, lê li gor Utas ihtimal e ku ew di dawîya serdema Sasaniyan de hatîye nivîsîn. Lewra varyantên berdest yên ji ber wê hatine nivîsîn aidê sedsala 9 û 10ê Miladî ne (Utas 1377: 311). Xuya ye ku vehonandina metnê *Ardavîrafnameyê* serdema Sasaniyan e û di nava çavkaniyên wê de metnên wek *Avesta*, *Dînkêrd*, *Vendîdad*, *Mînû-yi Khîred*, *Da[di]stan-i Dînîk* û hin berhemên edebî û dînî yên edebiyata Pehlewî jî cih digirin (Yıldırım 2019: 20-21).

Ardavîraf ji bo sefera alema din, xwe dişot û cilên paqij li xwe diket û xwe li ser nivînên xwe dirêj diket. Wesiyeta xwe diket û ji destê pêşewayên dînî sê qedeh "beng"ê vedixwe û "baj" a xwe dixwûnît û paşê bi xewra diçit. Ardavîraf piştî derbasê alema dî dibit, bi nezareta du milyaketên mezin, heft roj û heft şevan li Cennet, Cehennem û 'Erefê digere. Halê insanên gunehkar û cezayên wan, herwisa halê qencan û mukafatên wan bi çavê xwe dibînît. Di dûmahîka sefera xwe de diçite huzûra Ahura Mazda û dawîya dawî vedigerite dinyayê. Piştî wê jî hemû tiştên ku dîtine bi katibekî zana didete nivîsîn.

2.4. Komediya Ilahî: Cennet, 'Eref û Cehennem

Komediya Ilahî ji aliyê Dante Alighieri (1265?-1321) ve hatîye nivîsîn. Berhem ji 100 kantoyan û bi tevahî 14.233 risteyan pêk têtin. Lehengê berhemê Dante bi xwe ye ku ew diçe rêwîngiya alema dî û piştî dîtina Cehennem (Inferno), 'Eref (Purgatorio) û Cennetê (Paradiso) vedigerite dinyayê. Piştî wê vegeerê, ew vê geriyana xwe bi şiklekî menzûm dinivîsît (bnr.: Dante Alighieri 2020).

Komediya Ilahî, têkilî bi qadên wek teolojî, mîtolojî, tebîet û edebiyatê re heye. *Komediya Ilahî* di nav têkçûneke civakî de û ji "sistîya dînî" ya di nav sazîyên wê serdemê de derketîye. Jixwe Dante di *Komediya Ilahîyê* de behsa serdemê di navbera salên 1308-1320ê diket. Gava mirov lê dinêre mirov dibîne ku qeşe û papayên zemanî ketine nav gendelî, rişwet û zikreşîyê. Yanî di wê dewrê de kesayetiyan dînî yên li cografîyaya Ewropayê de ji rêya rast derketine û ji bo ku dîsa bêne ser rêya heq, muhtacê vejînekê ne (Erdi 2020: 7-8).

Digel çarçoveya giştî ya berhemên eskatolojîyê hin xalên cuda yên wê metnê hene. Ji wan xalan ya balkêştir ew e ku em rastî çîrokên vehonandî/rastî yên karekteran tîn. Yanî taybetîya *Komediya Ilahîya* Dante ew e ku têde digel hûrgiliyan giştî yên teswîrên Cehennem, 'Eref û Cehennemê, çîrokên şexsî jî ne. Di berhema Dante de ew ferq jî derdikeve ber me ku gava ew teswîra dinyaya dî dike, ew di her qateke cuda ya Cehennem yan Cennetê de behsa her cure insanîyan dike; karakter û serpêhatiyên wan yek bi yek vedibêje. Bi şiklî mirov dikare bibêje asta afirandina edebî di berhema Dante de bilind e. Bi gotîneke dîn, berhemên li ser teswîrên wê alema rastî hatine nivîsîn, çawa ku "dinyayekê diafirînin" di *Komediya Ilahîyê* de jî "alema din" ji nû ve hatîye afirandin. Yanî di vê berhemê de tenê motîvasyona dînî nîne, digel wê, çavdêriya amaca edebî jî hatîye kirin. Loma di vî warî de *Komediya Ilahî* ji metnên dî yên eskatolojîya Rojhilatê cudatir xuya diket.

2.5. Mînakên “Mi’racname/Mi’raciye”yan

“Mi’racname” di edebiyata klasîk de wek curreyêke edebî derdikeve pêş me. Di van curre metnan de behsa serpihatiyên Muhemmed Pêxember yên mi’racê têne kirin. Muhemmed Pêxember li gor neqla *Qur’anê* ji Mescidul-Heramê (ji Mekkeyê) çûye Mescidul-‘Eqsayê (Qudsê) û paşê bilind bûye esmanan (*Qur’an*, el-‘Isra 17/1). Bi vî şiklî wek bi mîtosa jêhelbûnê de têtê dîtî, ew bilind bûye esmanan. Jixwe kelimeya mi’racê jî koka ‘urûcê ya bi me’naya “bilindbûn, jêhelbûnê” hatiye û mi’rac bi xwe têtê me’naya “wesiteya jêhelbûnê û pêlekana”ê (Yavuz 2005: 132). Di neqlên Islamî de—yên exleb di nav ne’t û mewlûd û berhemên li ser siyerê de heyî—ji bo wesiteya jêhelbûnê ya di mi’raca Muhemmed Pêxemberi de navê “buraq” derbas dibit. Yanî Muhemmed Pêxember li hespeke bi navê Buraq (paşê jî li Refref) siwar bûye û çûye esmanan.

Di lîterature Islamî de li ser mahiyet, naverok û şiklê mi’racê nêrînên cuda hene, ka Muhemmed Pêxemberî sefereke rasteqîn kiriye yan ew di xewna xwe de çûye yan jî ka sefera wî rêwîngiyêke metafizîk bûye. Lê ew nîqaşanên teolojîk yên derbareyê mahiyeta mi’racê bigehine kîjan encamê jî ferq nake. Lewra bi her halî ve diyar e ku mi’racê, ji mîtos û motîfên hevpar yên giştî sûd wergirtiye ku ew hindî di nava teolojiyê de ye, ewqas jî divêt di nava eskatolojiyê de bête nixandî. Çawa ku hem di qisseyên pêxemberên dî de yên wekî ya Ye’qûb Pêxemberî, di mi’raca Muhemmed Pêxemberi de jî heman “jêhelbûn” têtê dîtî. Yanî nerdivan û motîfên wisa, îşareta hevpariyê û çandeke giştî/mîtolojiyê diket. Herwekî di serpêhatiya Ardavîraf de diborî ku gava ew vedigeriya dinyayê, muxbedên Zerdestî bo wî şerab diînan, di mi’racê de jî wextê Pêxember li Mescidul-‘Eqsayê du rika’et nimêjê diket, Cibraîl du qedehan pêşkêşê wî diket. Di yekê de şerab di ya dî de jî şîr heye. Lê Pêxember qedeha şîrî werdigire ku li ser wê yekê Cibraîl dibêjît “te fitret hilbijart” (Yavuz 2005: 132). Bi vî şiklî mirov mi’racê digel metnên eskatolojîk muqayese bike, dê gelek xalên hevpişk bêne dîtî.

Ji aliyê dî ve hinek taybetiyên xweser yên mi’raca Islamî hene ku ew ji serpêhatiyên dî yên jêhelbûnê cuda ne. Bo numûne di Islamê de ew mesele wek “Isra û Mi’rac” têtê zanîn. Lewra Muhemmed Pêxemberî du sefer kirine, yek sefereke “berwarî” (horizontal) ye ku li vê dinyayê pêk hatiye. Yanî sefera Muhemmed Pêxember ya ji Mekkeyê bo Qudsê ye, ji ber ku bi şev pêkhatiye jê re gotine “isra.” Sefera dî “berjor” (vertical) e ku ew jî mi’rac e yanî jêhelbûna esmanan e. Bi vî şiklî xalên cuda/xweser yên mi’racê hene ku ew di metnên dî de nehatine, yan jî ew bi guherîna hin mîtan ve ji nû hatine neqlkirin. Herwisa di mi’raca Muhemmed Pêxemberî de wek çûna sidretul-muntehayê, li ser kêmkirina reka’etên nimêjê û li ser vê yekê diyaloga di navbera Muhammed û Mûsa de û çend cudahiyan bi vî şiklî derdikevine der ku ew motîfên Islamî ne.

Di vê çarçoveyê de gava mirov li edebiyata Rojhilatê ya dewra Islamê dinêre, têtê dîtî ku berhemên serbixwe li ser vê mijarê hatine nivîsîn hene. Ew berhem wek “mi’raciye” yan jî “mi’racname” hatine nasîn. Ji aliyê dî ve di çanda vegotina çîrokan/mesnewiyan de meseleya mi’racê, wek qaideyêke hiyerarşik ya tenzîma berheman de wek beşeke sereke hatiye nixandî/nivîsîn. Herwisa mu’cizeya mi’racê û digel metnên edebî, di mînyatur, musîqî û xettatiyê de jî bûye mijareke sereke. Lewra di *Qur’anê* de hem di sûreya Israyê de hem jî di sûreya Necmê de behsa mi’racê hatiye kirin ku vegotina *Qur’anê* tesîr li ser qadên hunerî/edebî kiriye. Di Islamê de vegêrana meseleya mi’racê wek bûyereke esasî yanî bi îmanê ve girêdayî têtê dîtî. Lewra ew di *Qur’anê* de navê mi’racê derbas nebe jî “sûreya Me’aricê” heye û bûyera mi’racê jî di nav metnên tefsîr û hedîs û şerhan de hatiye îzahkirin. Loma ji mewlûd û siyernameyan heta di hin metnên wek *Qesidetul-*

Burdeya Ka' b b. Zuheyri (mr. 645?) û berhemên navdarên wek Ehmed Xezzalî (mr. 1111), Evdîlqadir Geylanî (mr. 1165) û Ibnî 'Erebî (mr. 1240) de em rastê neqla mi'racê tên (Uzun 2005: 135).

2.6. Destaneke Berbelav: "Cimcime Siltan"

"Destana Cimcime Siltanê" bi şax û xalên xwe yên belavbûyî ve hem di nava edebiyata nivîskî hem jî ya devkî de têtê dîtin. Varyantên vê destane di gelek çandên cuda de peyda dibin ku di Kurdî de hem bi şiklê nivîskî/destxet hem jî wek çîrok/destan têtê vegotin. Li gor çîroka vê destanê, rojekê Îsa Pêxember rastê kuloxekî (kelle, qafkê serî) dibit, yan jî piyê wî li wî kuloxî dikevit. Îsa Pêxember mereq diket ka ew hêstik, yên çi kesekî ne. Paşê ew kulox bi ziman dikevit û behsa serboriya xwe diket. Dibêjît ez siltanekî ne-bawermend bûm, lê min îdareya millet û memleketê xwe li ser edaletê rêve dibir. Li ser wê, Îsa Pêxember ji Xwedê dixwazit ku ew xwedanê wan hêstikan û wî kuloxî zindî biket. Xweda wê daxwaza Îsa Pêxember bi cih diînit û ewî divejnit. Piştî wê, Cimcime Siltan zindî dibit û li ser dîne Îsa Pêxember 'umreke dî diborînit.

Ji aliyê eskatolojiyê, di vê destanê de Cimcime Siltan, piştî vegerîna ji alema miriyan, li ser pirsên Îsa Pêxember behsa wê alemê diket. Yanî teswîrên Cennet, 'Eref û Cehennemê bi devê wî têtê vegotin. Lê di vê çîrokê de xala ji metnên dî yên eskatolojîk cuda ev e ku insanekî sax naçite alema din, yekî mirî sax dibîteve. Anko mirin/sefereke me'newî nîne. Bereksê wan metnên din, zindîbûna miriyekî heye ku ew ji alema ebedî têtê vê alema insanî/maddî.



"Îsa Pêxember ligel kuloxê Cimcime Siltan diaxivît."
ji (*Heft Kitab* 1346: 7)

Di Farsî de bi navê “Efsane-i Sultan Cumcume” mesnewiyek li ser wê hatiye nivîsîn ku muellif kesek bi navê ‘Ettar e lê ew ne Ferîddudînê ‘Ettar e. Di Farsî de çapên cuda yên wê versiyonê bi “çapên sengîn” hatine kirin (bnr: *Heft Kitab* 1346). Herwisa di Tirkî de versiyonên cuda hene ku ji wan hindêk wek wergerên mensûr jî cih digirin Cimcime Siltan wek çîrok/destan di gelek ziman/çandan de bi versiyonên cuda têtê dîtin (bnr.: Çiftoğlu Çabuk 2018; Babacan Bursalı 2018).

3. DI KURDÎ DE NUMÛNEYÊN METNÊN LI SER JIYANA PIŞTÎ MIRINÊ

Mijarên wekî mirin û qiyametê yan jî axret, Cennet û Cehennemê hem ji aliyê dînî ve hem jî ji aliyê mîtolojiyê ve xwedan şaxên berbelav in. Di nav Kurdan de jî ev şax bi şiklê mîtos û metnên dînî têne dîtin. Helbet divêt bibêjin ku numûneyên me bi dest êxistine Kurmancî ne. Loma gava em behsa lîteratureke eskatolojiyê bo Kurdî dikin, dibit ku berhemên zêdetir wek mînak bêne dîtin û vegotin. Lê wek ku ji mînakên li jêrî dê bête dîtin—jîbilî varyanteke Soranî ya Cimcime Siltanê, bnr.: (*Dastanî Sultan Cumcume*, 2014)—mînakên ku me tesbît kirine Kurmancî ne. Loma ev xebata me ji vî alî ve teng e. Lê amaca vê xebatê ew e ku bibite destpêkek da ku di vî warî de bêhtir berhem—hem yên bi Kurmancî hem jî yên bi zaravayê dî—bêne berhevkin.

3.1. Di Kurdî de Varyantên Destana Cimcime Siltan

Destana Cimcime Siltan ji aliyê têgehestina metnên eskatolojîk ve numûneyeke balkêş e. Di nava varyantên wê de jî numûneyên devkî yên Kurdî balkêş in. Ku me gelek varyantên wê yên devkî li herêma Hekkariyê berhev kirine ku di wan de çend xalên girîng, ji varyantên dî cuda dibin. Lewra di varyantên devkî yên Kurdî de xaleke zêde—pêş-çîrokek yan jî dibaceyek—heye. Ew pêş-çîrok yan di eslê çîrokê de hebûye ku ji varyantên dî ketiye, yan jî di Kurdî de ew xal paşê zêde bûye. Yan jî ew ji çîrokeke dî hatiye wergirtine û li wê hatiye montekirin. Ew pêş-çîrok jî eve ye: Xwedê rojekê ji Ezraîlê melekê mewtê dipirsit: “Ka te gava rûh kêşane herî zêde dilê te bi kê/i ve maye û tu ji ber xemgîn bûyî?” Ezraîl jî wisa ciwabê didet: “Herî zêde jinikeke ku şîr dida zarokê xwe û min li ser emrê te di wê gavê de rûhê wê jinikê kêşabû. Aha ji ber rûhê wê dayikê ez zêde êşiyame.” Xweda li ser wê dîsa dipirsit: “Ka di rûhkêşanê de kê/kî zêdetir tu westandî ku te bi zorê rûh kêşaye?” Ezraîl li ser wê jî dibêjît: “Rûhê Cimcime Siltani! Lewra min çend kêşaba jî wî rûhê xwe teslîm nedikir û ez gelek pê ve mam!” Hingî Xwedê dibêjît: “Aha ew Cimcime Siltan, ew zarok bû yê ku te rûhê dayika wî dikêşa û wî jî memikê dayîka xwe dimêt.”

Ev dibaceya balkêş di varyantên zimanên dî de nahêne dîtin. Lewra ji Farsî heta di-yaletên cuda yên Tirkî, ev destane hatiye gotin û nivîsîn. Lê di hemûyan de rasterast çîrok bi rasthatina Îsa Pêxemberî ya li kuloxê Cimcime Siltan ve destpê diket. Li ser vê yekê divê wê xalê destnîşan bikin ku ev pêş-çîroka di serê destanê de, her wekî teswîrê Îsa Pêxember e yê ku wextê di himbêza Meryemê de. Yanî ev dibaceya di varyantên Kurdî de, hevdeng e ligel mîtosê jêhelbûna bi esmanan û vegeşîna ji esmanan. Lewra Îsa, xwedî mucîzeyê vejandina miriyan e û herwisa ew nemiriye, lê jêhel çûye ber esmanan. Herwisa ew di roja qiyametê de dê wek xilasker dê hêteve. Lê ew teswîrê zarokê di koşeya dayikê de yê ku memikê dayika xwe dimêt, bi serê xwe wek mîtoşeke muhim xuya diket. Çunku heman teswîr, di mîtolojiya Mîsrê de derdikevîte pêş me ku di wê de jî di koşa Îsîsê de zarokê bi navê Horus cih digirît (bnr: Hall 2017: 44) ku di naveroka serpehatiya

Îsa Pêxember û dayîka Meryemê de hevbandiyek ligel ya Îsîs û Horusê heye. Gava mirov li ser wan mîtosan li destpêka varyantên Cincime Siltanê yên Kurdî vedigerit ku ew çarçoveya di serî de ihtimalen peywendî ligel wan mîtosan heye.



Îsîs û Horus, mid 7th-late 1st century BCE,
Harvard Art Museums

Di Kurdî de digel versiyonên devkî, çend destnivîsên Cimcime Siltanê jî têne dîtin ku ji wan yek jî bi alfabe Suriyanî hatiye nivîsîn. Metnê vê varyantê jî aliyê Ramazan Ergin ve di sempozyomê de hatiye pêşkêşkirin ku di vê pêşkêşiyê de navê vê destanê wek “Qahfê Cimcimo” derbas bûye (Ergin 2011: 437-445). Ji aliyê dî ve di hejmara yekem ya kovara *Rewşenê* de jî em rastê du numûneyên balkêş yên vê destanê tîn. Ji vane yek bi serenavê “Efsana Cimcimê Siltan” e ku rasterast bi ser navê keseke “Cotkar” hatiye berhevkirin/nivîsîn. Derbareyê çavkaniya wê û cihê vegotinê agahiyeke wisa tête dayîn: “Li gundê Xezewiyê, ba Şêx Hemîdê Qadî -Hec Alî- Şêx Birîm, birayê Xusxel, di vê civatê de li hev rûniştin, çêroka Cimcimê Siltan hat gotin. Şêx Hemîdê Qadî dest bi çêroka xwe kir û got (Cotkar 1988: 56).” Herwisa di heman hejmara *Rewşenê* de—ihtimalen ji aliyê Cotkar ve—bi berhevkarîya Eugen Prim û Albert Socin ya aidê sala 1887ê bi serenavê “Cimcime Siltan” varyanteke vê destanê hatiye belavkirin ku ew di nêzikê forma helbestê de ye (Prim û Socin 1988: 59-60). Herwisa Feqe Reşîd jî di *Sirru’l-Mehşerê* de de navê Cimcime Siltan digel navên siltanên berê bibîr tîne (Feqe Reşîdê Koçer 2002: 15). Digel ku varyantên me xwe gehandinê Kurmancî ne, lê berhevkarîyeke vê destanê bi Soranî hatiye weşandin (bnr.: *Dastanî Sultan Cumcume* 2014).

3.2. Nehcul-Enam

Berhema Mela Xelîlê Sêrtî (1750?-1843) *Nehcul-Enam* jî bo mijarên wek eskatolojî û jiyana piştî mirinê numûneyeke muhim e. Di vê berhema kurt de bi awayekî hiyerarşik, pêşiyê medhên Xwedê û pêxember tîn, paşê jî mijar tête ser mi’rac û qiyametê. Di beşa 7. (Mebhesul-Mi’rac) de çûna Muhemmed Pêxember ya ji Ke’beyê ber Qudsê û îmamtiya wî ya ji bo hemî enbiyan (“li wê bû îmamê ewê alemê”) di çar beytan de hatiye vegotin. Di van beytan de meseleya mi’racê bi gelek kurtî hatiye vebirîn. Piştî çûna Muhemmed Pêxember ya bo sidretul-muntehayê û nêzikbûna wî bi Xwedê ya “qabê du qewsan” tête neqlkirin, wî “bi çavê serê xwe Xwedê dî[tiye] du car (Mela Xelîlê Sêrtî 2002: 24).” Di beşa 14. de jî mijar li ser ‘elametên qiyametê ne ku di vê beşê de hem jî bo wextê qiyametê hem jî ji bo eskatolojiya Islamî de baweriyên mewcûd hatine vegotin. Wek mînak zuhûra Mehdî û xurûca Deccal, nazîlbûna Îsa Pêxember û bi heftê salan hukmê wî yê li ser dîne Muhemmed û piştî mirinê medfûnbûna wî di qebrê Muhemmed Pêxember de, baweriyên me’lûm in ku di *Nehcul-Enamê* de têne dubarekirin (28-29).

Yek ji xala girîng ya eskatolojiya Islamî ew e ku têkiliyekê di navbera dawî-hatina dinyayê û dawîbûna-tewbeyê ye. Lewra di sa’eta qiyametê de deriyê tewbeyê tête girtin ku mirov dişê vê metaforê herwekî girtina deriyê esman/têkiliya li gel Xwedê bibînit, yan jî wekî mítosa keştiye Nûh Pêxemberî binirxînit. Lewra di herdu mînakên de jî xilasî (dawî) nêzik e lê xilasî (necat) jî meydane radibit. Ji ber wê jî Mela Xelîlê Sêrtî di beşa 14.ê de qiyametê wek “[wextê] fitne”yê dibînit ku wê bi mítosên “Yecûc û Mecûc”, “Dabetul-‘Erz” û “Deccal” ve îzah diket (29).

Beşa 15. ya *Nehcul-Enamê* li ser sualên qebrî û qiyametê ne. Di vê beşê de jî digel motîfên wek “sirat”, “mîzan”, “sidretul-munteha” û “hisab”, tebeqeyên Cennet û Cehennemê têne gotin. Li gor vegêrana vê berhemê “Cennet li esmanê heftê û Cehennem jî li bin erdê” ye û insan ji pireya li ser derbas dibin û Musliman diçin Cennetê, gunehkar piştî demek ezabê bibînin, diçine Beheştê. Kesên munkir û kafir jî daimî di Cehennemê de dimînin (Mela Xelîlê Sêrtî 2002: 29-31). Bi vî şiklî di *Nehcul-Enamê* de, ji aliyê hizra qiyametê û xilasbûna dema vê alemê (axir-zeman) ve baweriyên Islamî hatine neqlkirin.

3.3. Rewdun-Ne'im

Rewdun-Ne'im mesnewiyeke dîdaktîk e ku li ser hilye û mi'racê hatiye nivîsîn. Ev berhema Şêx Ebdurrehmanê Aqtepi (1850?-1910) ya ji 35 beşan pêk têt û ji aliyê mijarên eskatoloji û jiyana piştî mirinê ve têde hûrgiliyên berfireh hene. *Rewdun-Ne'im* ji aliyê motîfan ve jî metneke muhim e ku mijarên wek mirin, şemaila Muhemmed Pêxember û mi'raca wî û Cennet-Cehennem, bi nêrîna Islamî hatine vegotin. Bi vî şiklî, Aqtepi di berhema xwe de hem wesfên fîzyolojîk yê Muhemmed Pêxemberî hem jî wesfên mi'racê bi detay neql kirine. Ji ber vê yekê, mirov dişet bibêjît ku di edebiyata Kurdî de berfirehtir hilye û miracname *Rewdun-Ne'im* e.

Aqtebî di *Rewdun-Ne'imê* de ji beşa 7ê heta beşa 21yê behsa wesfên pêxemberî diket û ji beşa 22yê heta dawiyê jî behsa mi'racê diket. Muhemmed Pêxember bi wesfên wek "Şahê axirzeman" têtê bi nav kirin (Şêx Evdirrehmanê Axtepi 1991: 32). Aqtepi, bi vegotîneke estetîk ku hev deng bi zimanê metnên Klasîk e, pêxember medh dîke ku ev uslûba wî, hem asta berhema wî bilind diket, hem jî bi mijara mi'racê motîfên mîftîk di nav mezmûnên tesewwufî de digehînite hev. Bi vî awayî di *Rewdun-Ne'imê* de temamê serpehatiyên Pêxemberî xal bi xal hatine vegotin ku Pêxember hem hatiye medhkirin hem jî wesfên dinyaya piştî mirinê hûrik hûrik hatine gotin.

Di *Rewdun-Ne'imê* de xalên bêhtir bala mirovî dikêşin diyalogên di navbera Pêxember û milyaketan de ne. Lewra Muhemmed çiqas ku ji qonaxekê derbasê qonaxeke dî bibît, bi awayê vegotîneke serkeftî her qonax hatiye ravekirin. Bo numûne siwarbûna Pêxemberî bi ser perêt milyaketan û geriyana li ser wan, geheştina bi qatên esmanan û bi Cennet, Cehennem û sidretul-muntehayê, di asta mesnewînivîseyeke serkeftî de hatine nivîsîn. Bi vî şiklî danasîna Cennet û Cehennemê ya bi devê Cibraîlî û xalên wisa yên ji aliyê vegotîna estetîk ve dewlemend, di zihna xwendevên metnê de alema din wek alemeke muşexxes neqş diket. Ew yek ji aliyekê ve girêdayê paşxane û motîvasyona Aqtebî bit, ji aliyekê ve jî girêdayê kûrahiya muktesebata van mijaran e.

3.4. Sirru'l-Mehşera Feqe Reşîd

Berhema Feqe Reşîd (1883-1932) *Sirru'l-Mehşer* li ser eskatolojiya Islamî hatiye nivîsîn û ji aliyê form û naverokê ve jî (digel çend kêşeyên metnê berhemê) xwe dispêre nerîta vegêrana/edebiyata klasîk. *Sirru'l-Mehşer* bi awayê mesnewiyê hatiye nivîsîn û muellifî jîbîlî vê berhemê du metnên dî jî nivîsîne. Ew jî "Huneynîye" û "Cihanşah" in ku ew hêj nehatine çapkirin (Feqe Reşîd 2020: 20; Gemi 2008: 136). Lê *Sirru'l-Mehşer* çend caran hatiye çapkirin (Feqe Reşîd 2020; Feqe Reşîdê Koçer 2002; Feqî Reşîdê Koçer 2014).

Ji aliyê naverokê ve gava mirov berê xwe didete *Sirru'l-Mehşerê*, wek metneke eskatolojiyê ev berheme wekî gelek metnên dî yê dînî di nava bawerîya Islamê de behsa mirin, qiyamet û teswîrên Cennet û Cehennemê diket. Lê taybetîyeke vê metnê ew e ku wek ku di gelek metnên mi'racîyeyan de têtê dîtîn, tesnîfa ehlê Cehennemê cih digire. Muellif ehlê qiyametê (di nava Muslimanan de) dikete deh cûn/sinif û ji wana tenê cûnek "ehlê naciye" ye yanî yê ku ji agirê Cehennemê xilas dibin. Neh cûnên dî jî ew in yê ku malê heram xwarine û zîkat nedane, yê ku di ticaretê de hîle kirine, yan jî yê ku zîna kirî û şahdeya derew kirî û insanek kuştî... Bi vî şiklî *Sirru'l-Mehşer* herçend teswîra "alema din" bike jî mesajên wê zêdetir ji bo "cimaeta hazir" in. Ji ber wê jî ev berheme ji aliyê vegotîna metnê ve ji motîf û mîtosên giştî yê li dor jiyana piştî mirinê zêde tesîr negirtiye û temamî di nav çanda Islamî de xeber dide. Jixwe muellifî ev yek bi zanebûn honandiye

ku di teswîra qiyamet û vejînê de ji termînolojîya dînî ya mewcûd derneketiye der. Bo numûne piştî hemû insan û mexlûq dîmirin her çar milyaketên mezin jî dîmirin. Piştî vejînê ji ummetê neh firçe ber bi Cehennemê ve diçin û bi şefa'eta xwe ve Muhemmed Pêxember wan ji agirî xilas diket. Di van qîsman de hem behsa pêxemberên dî hem jî behsa çar xelîfeyan têtê kirin ku hem di nava vegêrana Islamî de mesele têtê gotin hem jî ligel van hemû şexsiyetên dînî, rola Muhemmed Pêxember têtê pesendkirin. Jixwe di vegêrana Islamî de yek fonksiyona girîng jî ew e ku metn li ser merhemet û siyaneta pêxemberî hatine nivîsîn. Lewra di heşr û qiyametê de Muhemmed Pêxember, ummeta xwe ji şefa'etê mehrûm naket û wan ji agirê Cehennemê “necat” diket. Lewra diyar e ku yek ji motîvasyonên nivîsîna wan berheman geheştina şefa'eta pêxemberî ye û bi nivîsîna wan metnan hem li hember pêxemberê ummetê siyanet têtê nîşandan hem jî hevî heye ku ew li axretê bibîte sebêbê necatê. Jixwe çawa ku di *Mewlûda Bateyî* de jî derbas dibit, têkiliyeke xurt li gel Muhemmed Pêxember û dana selewatên li ser rûhî wî û necatê heye ku Bateyî dibêjît: Ger divêtin hûn ji narê bin necat/ Bi ‘îşq û şewqek hûn bibêjin es-selat (Mela Hisênê Bateyî 2003: 34).” Çawa ku Bateyî di *Mewlûdê* de vê beytê di heman peywendê de tekrar dike, Feqe Reşîd aşkeratir heman tiştî di dawîya berhema xwe de îfade diket: “Hûn eger derman dixwazin li necat/ Li Ebu'l-Qasim bibêjin es-selat (Feqe Reşîd 2020: 121).” Bi vî şiklî mirov dişê bibêjît ku ne tenê di vê mînaka Kurdî de, di exleb metnên Islamî yên li ser eskatolojî û mirinê de roleke metnan jî ew e ku pesnê Muhemmed Pêxember bête dayîn.

Di *Sirru'l-Mehşerê* de Feqe Reşîd mijaran di nav lîteratura dînî—ya li dor meseleya jiyana dinyayê û ya axretê—de vedibêjît. Yanî wî xwe spartîye vegotin û riwayetên dînî. Lê digel wê wî jî wekî muellifên dî yên Musliman, ev aleme wek “warê hêlanê” û axret jî wek “warê ebedî” dîtiye. Lewra di baweriya Islamî de ev aleme cihê seferê ye yanî insan di rêwingiyekê de ne, yanî misafir in. Herwiha li vê dinyayê kesek ebedî najît û bi rêya mirinê ew misafirî tamam dibit. Di encama wê nêrînê de jî kesên bi qudret jî nemane û wan jî koça warê ebedî kirine. Ji ber wê ye ku di *Sirru'l-Mehşerê* de navên wan kesên ku di hafîzeyê Muslimanan de di vê kontekstê de cih digirin hatine dayîn. Bo numûne navên wek Nuşîrewan, Cemşîd, Rustemê Zal û Qeyser; Suleyman Pêxember, Fir'ewn, Nemrûd, Iskender û Cimcim; ‘Elîyê Murteza û Muhemmed Pêxember fanîbûna vê dinyayê di zihna xwendevanî de dineqşîne (Feqe Reşîdê Koçer 2002: 10-15). Lewra eger wan şexsiyetan ev dinyaye hêlabin, nexwe ev ware warekî ebedî nîne.

Di *Sirru'l-Mehşerê* de vegotîneke Islamî hakim e ku honandina metnê xitabê Muslimanan diket. Lê digel wê hin xalên girîng/giştî têtê cih digirin ku mirov dikarî wan di nava eskatolojîya giştî ya dînen Rohîlatê de jî binirxînin. Bo numûne mîta xilasker û avabûna alemê ya piştî tunebûnê û mînakên dî imkanê didet mirovi ku vê berhemê digel metnên baweriyên dî jî hevber biket. Lewra bi taybetî ew qîsmên ku behsa ‘elamêtên qiyametê dikin balkêş in. Lewra peyda bûna Deccalî û cenga di navbera Musliman û kafîran de û epîzodên girêdayî wê yekê herwisa agahiyên gelek fanstastîk in jî. Di wêderê de Feqe Reşîd xwe distpêrîte hedîsên Muhemmed Pêxember. Lê ew teswîrên fîktîf xuya ye ku ji hudûdên hedîsê dertir in. Çunku li dewra qiyametê kafîr heta bajarên Şam û Helebê digrin û piştî şerî Musliman li hember kafîran dîsa serfiraztir dibin û bajarê Stenbolê jî nû têtê standin. Zelzele çêdibin û Deccal jî Xoresana Îranê peyda dibit. Yecûc û Mecûc derdikevin lê piştî zuhûra Mehdi û Îsa Pêxember dîsa her tişt safî dibit û her tişt dikevîte ser ‘eyara xwe ya eslî/tabî (bnr: *Sirru'l-Mehşer* beşa 4ê). Bi vî şiklî herçend ew vegotina di *Sirru'l-Mehşerê* de li ser hafîzeyêke Islamî hatibe avakirin jî ji gelek alî, sembol û mîtosan ve hevpariyên muhim di navbera metnên/vegotinên eskatolojîya baweriyên dî de hene.

3.5. Baxçeyê Jiyana Piştî Mirinê

Berhema Mela Yasîn Yusrî (1906-1994) ya bi navê *Baxçeyê Jiyana Piştî Mirinê* (*Rewzul-Heyat*) di nava çanda Islamî de bawerî û mîtosên li dor sekerat, mirin û piştî mirinê bi nêrîna seydayekî vedibêje. Di vê berhema Yusrî de mirin, dawî nîne. Jixwe navê berhemê li ser îmajeke erênî ya li dor axretê di zihnê muxetaban da çêdike: *Baxçeyê Jiyana Piştî Mirinê*. Yanî mirin tenê merheleyek e ku li “aliyê dî” warê eslî heye ku ji bo bawermendan ew der “baxçe” yanî “Cennet” e.

Di *Baxçeyê Jiyana Piştî Mirinê* de balkêş e ku Mela Yasîn Yusrî, di warê hedîs û riwayetên nav lîteratura Islamî de gelek gotinên li ser mirinê neql kirine. Ji vane yên balkêş ew pirs in yên ku Xwedê ji Muhemmed (Resûlê Nebî), Ibrahîm Pêxember (Xelîl) û Mûsa Pêxember (Kelîm) diket ku ka ew dê çawa bimirin (Mela Yasîn Yusrî 2011: 24). Bi vî şiklî Yusrî, hem di nava nerîta Islamî de vegotinên li dor mirinê û awayên wê neql diket hem jî wan riwayetan li gor têgehêştina xwe şrove diket. Ji bo wê jî ifadeyên wek “ku me’na weha jê fehm kir feqîr (24)”, “ku me’na weha hatî ber zihnê min (24)”; “ku me’na weha min teleqqî kirî (25)” bikartînit.

Mela Yasîn Yusrî, di muktesebata Islamî de çî curre riwayet hebin hem ji pêxember, sehabe û nifşên dî (wek, ‘Aî’şe, xelîfeyê Emewiyan ‘Umer bin ‘Ebdulezîz) hem jî ji ‘alim û navdarên wek Qurtubî (mr. 1273) riwayetan di destpêka berhama xwe de neql diket. Yusrî bi vî şiklî bingeha berhema xwe hê di serî de girêdidete çavkaniyên Islamî ku di vê babetê de hîlbijartina navê Qurtubî muhim e. Lewra tête zanîn ku di nava çanda Islamî de yek ji berhema navdar ya li ser mirin û jiyana piştî mirinê *Tezkiretul-Qurtubî* (*et-Tezkire fî Ahwalil-Mewta we Umûril-Axire*) ya Muhemmed bin Ehmed el-Qurtubî (mr. 1273) ye (Çelebi 2019: 595). Herwisa di riwayetên ku di çanda nivîskî ya Islamî de yên li dor mirinê hatine neqlkirin gelek enterasan in. Lewra bo numûne riwayeta ku “sehabî li ser qebran ji Xwedê dixwazin ku miriyek zindî bibe û rabe ji wan re behsa mirin û axretê bike (24-28)”, hem çîroka “Cimcime Siltanê” tînite bîra mirovî hem jî ji bo dîtina transfera mîtosan balkêş e.

Herwisa divê bête gotin ku li ser halê mirinê jî (yanî teswîra halê mirinê) Mela Yasîn Yusrî di serê berhema xwe de çend riwayetên enteresan neql diket. Di nav wan de te’rîfên halê mirinê balkêş in. Bo numûne Xwedê ji Ibrahîm Pêxemberî dipirse ka mirina te çawa bû ew jî dibêje “[m]islê şîşa ku bê sorkirin /Di hirya terr û şil de bê kaşkirin (24).” Gava Xwedê ji Mûsa Pêxember dipirsît, ew jî wisa mirina xwe teswîr diket: “Bi mislê çivîka bi saxî ku bê /Qelandin bi miqlatê roz û şebê //Ne dimire ku rahet bibit, ne dikar / Ku bifire wesa ma di miqlatê nar (24).” Herwisa Yusrî çend riwayetên wisa jî neql dike: “Wekî bê guran pez bi destê qesab (25).”

3.6. Beyta Qiyametê

“Beyta Qiyametê” digel “Beyta Sekeratê” tête zanîn ku ew herdu metn exleb bi hev re hatine nivîsîn yan jî istinsaxkirin. Di dawiya vê xebatê de varyanteke metnê “Beyta Sekeratê” hatiye dan ku me ew ji destxetekê veguhast. Di gel metnê wê beytê, herwisa metnê “Beyta Qiyametê” jî hebû. Di “Beyta Qiyametê” de teswîrên Cennet û Cehennemê li gor “Beyta Sekeratê” zêdetir bi hûrgilî hatine dan û meseleyên di vê çarçoveyê de berfirehtir hatine îzahkirin. Ji aliyê ebadê ve, ew ji “Beyta Sekeratê” dirêjtir e, lê hem ji aliyê naverok hem jî ji aliyê formê ve du metnên girêdayê hev in. Loma di desxetan de herdu beyt bi hev re ne. Derheqê muellifê vê beytê de jî agahiyên teqez nînin. Lê ihtimal heye ku herdu beyt aidê heman muellifî bin.

Di nava çîrokbêjîyê de jî ev beyte têtê gotin. Lewra jîbilî varyantên nivîskî, di zargotina Kurdî de jî ev beyte heye ku hindêk çîrokbêj/qesîdebêj wê jiber dibêjin. Herwisa ji aliyê Cankurd ve du varyantên vê beytê li ser bloga *Kurdaxê* hatine belavkirin. Ji bo varyantekî serenavê “Beyta olî” hatiye hilbijartin ku li gor agahiyên li ser, ev beyt di sala 1873yê de ji aliyê Evdiselam Xalidê Zêbarî ve hatiye nivîsîn: “Ev beyta xweşik, sala 1873ê Zayînî, ji aliyê Evdiselam ê Xalidî Zîbarî ve, ku ji xelkê Barzan e, hatiye lêkirin.” Herwisa di vê varyantê de dawîya helbestê de wek mexles “Xalidê Zêbarî” hatiye bikarînan (bnr.: Evdiselamê Xalidî Zîbarî 2011). Varyanteke di ya “Beyta Qiyametê” heye ku ew aidê Mela Mesîhayê Tirwanşî (1882-1973) ye. Ev varyante jî Cankurd di heman blogê de belav kiriye ku navê wê rasterast “Beyta Qiyametê” ye. Ev beyte ji aliyê naverokê ve heman varyantên di ne û gava me muqayese kir, ew û varyanta di destê me de heman metn in. Cankurd ev varyante pêşiyê li Duhokê di kovara *Vejnê* de weşandiyê û paşê li ser bloga xwe jî parve kiriye (bnr.: Mela Mesîhayê Tirwanşî 2010; Mela Mesîhayê Tirwanşî 1996: 91-108).

4. BEYTA SEKERATÊ

“Beyta Sekeratê” menzumeyek e ku li ser mirin û mijarên li dor mirinê hatiye honandin. Ev metne di destxetên cuda de heta îro hatiye ku derheqê muellifê wê de agahiyên cuda hene. Lê derheqê xalên bi vî şiklî agahiyên teqez nînin. Lewra hem li ser navê çend kesan heta îro hatiye qeydkirin hem jî varyantên wê yên cuda hene. Wek ku em dê li jêr behs bikin, bi nezera hin lêkolîneran, “Beyta Sekeratê” aidê Melayê Bateyî ye û hin jî dibêjin ew ya Feqiyê Teyran e. Feqet gava mirov analîzê li ser metnê vê vehînokê diket, mirov dibîne ku esasê xwe de hemû varyant jî aidê heman berhemê ne. Lewra di navbera nusxe/varyantan de cudahî hebin jî ew hind zêde nînin ku mirov bibêjit evne metnên cuda ne.

Li gor lêkolîna me, destxetên cuda yên “Beyta Sekeratê” hene. Li ber destê me du destxet hene ku ji wan yek me veguhastiye ku di dawîya vê xebatê de me daye. Me ew destxet ji Mela Mehemmedê Hekkarî (Pîrosî) wergirtibû ku wî jî di sala 1985ê li Geverê li gundê Wezîrava ji Mela Evdîlxefûrê kurê Mela Evdirrehmanê Weregözî standibû. Li gor haşiyeya ku Mela Mehemmedê Hekkarî li ser nivîsiye, ew texmîn diket ku herdu berhem (Beyta Qiyametê û Beyta Sekeratê) aidê Mela Hisênê Bateyî ne. Destxeta duyem jî her dîsa li Geverê me li cem Mela Evdîlmecîdê Gulordî (Abdûlmecîd Îliş) dîtiye ku ev nusxeye bêhtir nêzikê varyanta Birifkanî ye. Lewra ew jî wekî ya Birifkanî ji sê rêzan pêk têt û rêza dawî ya “estexrifullahul-‘ezîm”ê têtê nîne.

Li Bakur heta niha em rastê çapa “Beyta Sekeratê” ya çapbûyî nehatine. Lê li Başûr kêmanî çar caran metnê wê hatiye weşandin. Ji wan varyantên ku hatine weşandin yek jî ew e ya di nav *Dîwana Şêx Nûreddînê Birifkanî* de hatî. Herwisa Cemîl Mehemed Şêlazî di nav berhema xwe ya bi navê *Hindek Beytên Kurdî Ji Destnivîsên Mela Mistefa Oremarî (1920-1994)* de cih didete varyanteke “Beyta Sekeratê”. Lê beriya ku ew vê berhemê çap biket, metnê “Beyta Sekeratê” di kovara *Vejnê* de belav diket (bnr.: Şêlazî Cemîl Mehemed 2001). Herwisa Se’îd Dêreşî jî di nav xebata xwe ya bi navê *Kelhên Ava* de metnê vê beytê belav kiriye ku Dêreşî behsa çend destxetên cuda yên wê beytê jî diket. Ew destxet ew in yên bi navê “destxeta Mela Mehemed Emînê Berçî”, “destxeta Se’îd”, “destxeta Feqe Ehmedê Tixûbî” û “destxeta Zêwkî” (Şêlazî 2010: 9). Li gor neqla Se’îd Dêreşî di serê destxeta Mela Mehemedê Berçî de hatiye nivîsîn ku “Mehemed Miksî fermûyed.” Lê ji ber ku di çî cihên helbestê de navek neboriyê, Dêreşî bi xwe jî di vê babetê de ne misoger e, lewra dibêjit belkî benda mexlesê ji metnê qetiyabit (Şêlazî 2010: 9). Ji aliyê

dî ve Dêreşî di aidiyeta beytê ya bo Feqiyê Teyran de bi guman e, lê dibêjit ku “dûr nîne jî ev beyte ya Şêx Nûreddînê Birifkanî bit, ji ber ku gelek li ser awayê vehandina wî ve ye û gelek nêzîkî ya “Beyta Qiyametê” ye (Dêreşî 2005: 455, neql ji Şêlazî 2010: 10).” Zahid Birifkanî û Şêlazî bi xwe jî di vê babetê de wekî Se’îd Dêreşî difikirin ku ew di wê qinaetê de ne ku “Beyta Sekeratê” aidê Şêx Nûreddînê Birifkanî ye. Lewra, herçend di vî warî di destê wan de isbatek nebît jî ji ber ku ev metne li ser usûla “Beyta Qiyametê” ye, ew “Beyta Sekeratê” jî wisa girêdidine Şêx Nûreddînê Birifkanî (Şêlazî 2010: 10). Lê ji aliyê dî ve Zahid Birifkanî jî neql diket ku metnê wê helbestê di nava destxeta Şêx Memdûhê Birifkanî ya aidê *Dîwana Şêx Nûreddînê Birifkanî* de nehatiye. Wî ew helbest ji destxetê de wergirtiye û êxistiye nav *Dîwanê* (Şêx Nûreddînê Birifkanî 2001: 171-184; Şêx Nûreddînê Birifkanî 2002: 145-157). Bi vî şiklî jî ber “Beyta Qiyametê”, Şêx Nûreddînê Birifkanî wek muellifê “Beyta Sekeratê” jî hatiye dîtin. Lê çawa ku muellifê “Beyta Sekeratê” kifş nîne, yê “Beyta Qiyametê” jî herwisa ne diyar e.

4.1. Varyanta Beyta Sekeratê ya Şêx Nûreddînê Birifkanî

Varyanta “Beyta Sekeratê” ya Birifkanî, ji 100 bendên sê-rêzî pêk têtin. Ji nav van sed bendane jî 97 heb metnê eslî/Kurdî ne û sê bend jî du’ayên/selewatên bi Erebi ne (Şêx Nûreddînê Birifkanî 2001: 180, 183; Şêx Nûreddînê Birifkanî 2002: 154, 157). Beytên destpêkê (yanî yên heta benda 31ê ya varyanta di vê xebatê de), di varyanta Birifkanî da nînin. Herwisa di versiyona Birifkanî de rêza dawî ya tîrêjê/mutekerrir (“estexfirullahul-‘ezîm”) jî nîne. Jixwe ji ber vê yekê varyanta Birifkanî jî çarîneyê ketiye sêyîneyê. Lê eger muellifê vê beytê Şêx Nûreddînê Birifkanî bit, hingî jî mirov dikarî bibêjit ku ew rêza mutekerrir paşê li bendan hatiye zêdekirin û qalibê wê menzûmeyê ji sêyîneyê vegeyriyaye çarîneyê. Lê ji bo tesbîteke wisa, divê pêşiyê muellifê “Beyta Sekeratê” bête diyarkirin û li ser destxetan edîsyon-krîfîkek bête kirin.

Di “Beyta Sekeratê”ya Birifkanî de herwisa cudahiyeke dî jî bendên dûmahîkê ne. Di van bendan de du’â, hêvî û xwastina rehmetê ya ji bo xatirê Muhemmed Pêxember û selawatên li ser wî cih digirin ku ew di varyantên dî de nînin. Herwisa di dawiyê de vebêjer/şair, behsa xwe û vegêrana xwe diket. Lê li şûna ku mexlesekek bikarbin, ew tenê dibêjit “min got Beyta Sekeratê”:

Ya Reb, ji wextê nez’ û sekeratê
Me [hifz] bikî ji muhlîkatê
Bo xatirê Muhemmed seyîdul-kaînatê

*Ya Reb sellî ‘ela Muhemmedul-Mustefa
We ‘ela alîhi we-eshabîhi ehlel-sidq wel-wera
Îla yewmil-heşri wel-neşri wel-sefa*

Ey gelî birader û cema’etê
Min got Beyta Sekeratê
Da bo xwo bigrin ‘ibretê

*Summe hediye ten mîna ila rûhi xeyril-wera
We ila rûhi alîhi we eshabîhil-enwera
We ila kaffeti ehli-îman seransera*

Ya Reb bi navê xwo û Muhemmed key
Busulman wazih û katiba [hifz] key
Rehmeteka zor li ser wan bikey

(Şêx Nûreddînê Birifkanî 2002: 156-157)

Şêlazî, herdu metnên “Beyta Sekeratê” û “Beyta Qiyametê” li dûv hev ji kasetaya dengî ya Mela Mistefa Oremarî wergirtine û deşîfre kirine. Di nava wan herdu beytan de “Beyta Sekeratê” ya ku Şêlazî deşîfre kirî, veryanteke kurt e. Ku ew bi xwe jî wisa dibêjit ku “herçend ev beyte ne gelek bi rêkûpêk in belku, ya diyar e gelek pêş û paşî keftî ye di malikên wê da (Şêlazî 2010: 10).” Ji bilî van ferq û guherînan, di navbera varyanta Birifkanî û varyantên di de cudahiyan mezin nînin. Xala dawî, hebûna destxetên cuda û kasetên bi wan beytan ve dagirtî, ji aliyê belavbûna metnê û tesîra wan curre menzûmeyan îşaretên muhim in.

4.2. Varyanta Oremarî

Di vê varyanta “Beyta Sekeratê” de ji aliyê fonetîka hin kelîmeyan ve cudahî hene. Hemû varyantên ku li ber destê me ne, aidê hewza Behdînan in. Lê di navbera varyantên Geverê û yên mintîqa Duhokê de ferqek ew e ku ji aliyê hin kelîmeyan ve formên cuda hatine bikarînan. Bo numûne guherînan piçûk yên wekî “îro/evro” û “êre/hêre” cih digirin. Jîbilî mînakên wisa, varyanta Oremarî û varyanta ku me ji destxetê veguhasî gelek aliyên ve wekhev in.

Bi nezer varyanta me daye, hem varyanta Birifkanî hem jî varyanta Oremarî kurttir in. Lewra varyanta ku me daye ji 135 bendan pêk têt, lê ya Birifkanî 100 bend bû ya Oremarî jî tenê 61 bend e. Ji aliyê di ve ev varyanta Oremarî, ne ku ji nivîsê, lê ji dengê qeydkirî yê ji kasetekê hatiye veguhasîn. Loma jî çavkaniya wê ne destxet e û guherînan yan jî kêmbûna bendan asayî ye. Lê divê evê jî bibêjin ku ji aliyê telaffuza kelîmeyan û konteksta hin kelîmeyan de varyanta Oremarî nêziktirê rastiyê xuya diket. Loma me di nav kevana bi koşe [] de hindek kelîme li gor vê varyantê guherandine. Digel wê, di varyanta me de benda 77an nebû, me ew jî ji vê varyantê wergirtiye.

4.3. Nû-varyanta “Beyta Sekerat”ê ya Neweşiyayî

Ev varyanta “Beyta Sekeratê” 135 bendan pêk têt. Di her bendeke vê menzûmeyê de çar rêz hene, ango ew wek awayê nezmê ji çarînan hatiye sazîkirin. Ji aliyê naveroka xwe jî temamî li ser temaya mirinê ye û vegotin jî li dor hişyarkirina beriya mirinê ye.

Agahiya me ji vê varyanta “Beyta Sekeratê” bi rêya Mela Mehemed Hekkarî çêbibû ku wî ew menzûme di serê salên 2000î de li Geverê li ber çend parçe destxetan kopya kiribû. Herwisa digel vê metnê, menzûmeya “Beyta Qiyametê” jî hebû. Bi qina’eta Mela Mehemed Hekkarî, ev beytene yên Mela Hisênê Bateyî ne. Lê ji ber ku mexles yan jî navê kesekê têde derbas nedibû, tesbîta aidiyeta wan li ser şairekî zehmet bû û ji ber wê jî ew nehatibûne weşandin. Loma me xwest em vê varyanta “Beyta Sekeratê” bidine nasîn. Çunku ev menzûme hem li Başûr hatibû belavkirin û hem jî mirov bişêl li ser van metnan dergehekî nû bo vegotinên derbareyê mirin û axretê yanî bo qada eskatolojî û jiyana piştî mirinê veket.

“Beyta Sekeratê” wek metn li gor vegêrana çîrokî ya tradîsyona klasîk hatiye honandin. Vebêjerê wê, bi navê Xwedê (Subhan) destpê diket û paşê didete zanîn ku dê behs bête ser sekeratê. Divê bibêjin ku sûreya *Qur’anê* Îsra jî bi kelîmeya “subhan”ê destpê diket. Herwisa di sûreya Qiyametê de ew hişyariya ji bawermendan tête kirin, di “Beyta Sekeratê” de jî xuya diket. Loma tîrsa ji mirinê û ezaba qebr û Cehennemê ji nû ve bîr diînit.

Gava mirov li beytê dinêrît, têtê dîtin ku di vegotinê de muxeteb diguherin. Car caran muxeteb vebêjer bi xwe ye car caran ew pirjimar in (cima'eta Musliman). Car car jî zimanê diyalogê pêş dikevît ku ew diyalog jî digel Xwedê ye. Ew jî dînamîzmê didete vê beytê ku ew tevlîheviya diyalogan, hewar-hewar û şerpirzebûna kesê di sekeratê de jî temsîl diket. Jixwe di nava metnê de bi harikariya teswîrên fîzîkî yên li ser bedena insanî çêdibin jî ew dijawariya mirinê/sekeratê têtê pesendkirin. Lewra guherîna li organ û weselên wek "mêlak, dil, hinav, sing, ran, mil, pî û destan" pêk têt digel hissên tirsnak hevaheng hatiye vegotin. Herwisa "sekr" û "sekerat" wek me'na, îfadeya halê serxweşiyê û mestiya di halê mirinê de ye. Loma di metnên/mîtosên eskatolojîk û yên mi'racê de têkiliyek di navbera serxweşî û halê mirinê de yan jî di sefera bo alema dî de heye. Bo numûne di hem di *Ardavîrafnameyê* de Ardavîraf şerabekê/bengekê vedixwet hem jî wekî di mi'racnameya de derbas dibit, milyaket di destekê de qedehêka şîrî û di yê dî de jî şerabê pêşkêşî Muhemmed Pêxember dikin. Yanî çawa ew halê sekrê, di mîtosên seferên alema dî de jî derbas dibin, di vê beytê de jî ew halê sekr/sekeratê di usûla vegotinê de diyar diket. Herwisa (wekî ku di bendên 57-59an de derbas dibit) di jiyana piştî mirinê de Şeytan jî ji bo xapandinê di "aveke zelal" diînit. Bi vî şiklî "mîtosên afirandinê" û ya "der/ketina ji Cennetê û alema din" digehîte "daxilbûna axretê". Çunku insan/Adem bi destê Şeytan ketibû vê dinyayê û piştî mirinê jî Şeytan heman "dijmîniyê" diket (bend 59-60).

Ji aliyê naverokê ve jî peyama ev metne didet, hişyariya ji xewa xefletê ya vê dinyayê û hazîriya ji bo alema dî, tewbe û îstixfar e. Loma her bend bi îfadeya "estexfirullahul-'ezîm"ê xilas dibit. Di Islamê de mirin jî wekî jiyane rastiyek e ku di vê çarçoveyê de دنیا warê demkî ye û cihê bêhnvedanê ye. Lê warê bingeheîn axret e yanî alema piştî mirinê ye. Ji ber wê di vê beytê de jî li ser wê nêrînê amaca esasî ew e ku insan "bêîman neçite" alema dî. Lewra kesên bawermend gunehkar bin jî digel ezaba Xweda, rehmeta wî heye û şefa'eta pêxemberî jî hêviyêke mezin e (bnr: bendên 25-27). Feqet di nêrîna Muslimantiyê de herçend hêviyek mezin hebit jî li hember mirin û axretê tirs/xofeke mezin jî heye. Loma di "Beyta Sekeratê" de jî (bend: 30-35) dijawariya rûhkêşanê, ezab û tenêtiya di qebrî de, hatina melekên sualê (Munker û Nekir) xalên girîng in û ya balkêştir jî teşbîha mirinê ya digel qiyametê ye.

Di "Beyta Sekeratê" de bo bingeha çavkaniyan referans nehatine gotin. Lê bi aşkerayî jê têtê zanîn ku ev metne digel metnê dî yên li dor kozmogonîya Islamî hevdeng e. Lewra hem rîtuêl hem jî mîtosên di nav de hatine gotin, bi giştî ew in yên di nava wê çanda dîni de têne vegotin. Lewra ji teswîrên alema dî heta rîtuêlên mirî-şuştin, definkirin, kifnkirin û hwd. mutabiq in digel muktesebata Islamî. Ji aliyê dî ve "Beyta Sekeratê" digel metn/mîtosên dî yên eskatolojîyê ve jî mutabiq e. Çawa ku di mînakên dî de hate dîtin, di vê numûneyê de jî pêşî behsa Cennet û 'Erefê û herî dawî jî behsa Cehennemê têtê kirin. Wek taybetiyêke dawî ya vê metnê jî ew e ku insan li hember mirinê û heqîqeta alema ebedî hişyar biket. Ji aliyê dî ve jî ji bo ku bawermendan bo wê alema eslî "beriya mirinê" amade biket. Loma di dawîya her bendê de îstixfar heye.

Di dawîya vê xebatê de me metnê "Beyta Sekeratê" daye ku di hin cihên ku li gor varyanta ber destê me, sehîhtir xuya dikirin me ji varyanta Oremarî wergirtine. Herwisa ferqên di navbera herdu varyantan me di nav jêrenotan de dan. Bi vî şiklî dê hem ji aliyê zimanê metnê ferq û guherîn bêne dîtin hem jî dê nêzîktirê varyanta/nusxeya sehîhtir bin.

5. ENCAM

Qiyamet halê “rabûna ser piyan e” lewra li gor baweriyên dînî, insan piştî mirinê dê roja qiymatê hişyar bit û dê rabîte ser piyên xwe. Lê li vê dinyayê jî insan dixwazin miriyên xwe rakine ser piyan û xatireyên wan zindî bikin. Loma li ser mezarên wan kêliyan datînin. Çunku wekî ku Zeynep Sayın jî di *Ölüm Terbiyesiyê* de dibêjit “kêlî, xatireya miriyê razayî radikete ser piyan (10).” Insanên ku rastiya mirinê dizanin, yanî dizanin dê bimirin, dixwazin ku kêliyeke wî/wê hebit da ku piştî mirinê jî hebûna xwe ya dinyewî isbat bike. Çunku kêlî, miriyan û jiyana wan ya borî “girê”didete dinyaya jê çûye. Jixwe di Kurdî de kelîma “kêlî”yê digel me’naya “qaideya mezar”, têtê me’naya “girê”yê jî. Loma “kêlî”, miriyê di navbera herdu dinyayan de girêdidet (Tek 2019: 25-26), yan jî herdu dinyayan bi rêya mirinê bi hev ve girêdidet. Digel wê, herçend rîtuêlên ji bo miriyan hebin (wek kifn û defnkirin) ji bo zindiyan jî rîtuêl hene. Ji vane jî yek, ziyareta mezar e:

[Çunku] Romiyan malên xwe li ser mezarên kalikên xwe çêdikirin, kalikên xwe vedigerindine xwedawendên xwe yên şexsî. Ke’be wek mala ewil ya Xweda û her wisa ya yekem ya insanan têtê zanîn; ku ew jî mezarek e. Di Hicra Ismaîl de Hacer radizêt. Mezar û ziyaret ji heman kokê tèn. (Sayın 2018: 11)

Çawa ku “ziyaret”ê û “mezar” ji heman rihê tèn û ev peywendî (etîmolojî) bi rêya zimanî têtê sazkin, peywendiya erd û esmanan, ya jiyana lêre û ya wêrê jî bi rêya mirinê têtê sazkin. Mîtosên li dor mirinê, bi tevahî eskatolojî û rihên mîtolojiyê yên qedîm imkanê didin ku em kêliyên van peywendiyên bibînin. Ji ber wê jî rîtuêlên mirinê, rîtuêlên qurbankirinê, seferên bo alema miriyan û mîtosên wek jêhelbûnê, hinek tiştan li ber me sahîtir dikin. Miriyên digel maiyet, heywan û mucewherên xwe dihatin veşartin yan jî rîtuêlên bi vî şiklî, îşareta hizra derbareyê dinyaya dî dikin. Loma hevpariya rît û mîtan û serboriya wan bi serê xwe rêyê li ner me vedikin ku em seferên insaniyê yên du-alî çêtir têbigihin.

Nêrînen bi berawerdkirina mîtosên kolektîf nîşa me didin ku insanan di nav baweriyên cuda de refleksên nêzik hev dane. Bi taybet li ser mirin û alema piştî mirinê, hevpariya mîtos û transfera mît/motîfan ber bi çav in. Loma nav yan jî mahiyet cuda bin jî, çavkaniya rihê gelek ji wan mîtosan yek e. Ji ber wê jî ev rihê hevpar, herdu dinyayan digehîne yek. Bo numûne xalên hevpar yên girîng di navbera rîtuêlên şandina miriyan bo alema dî (wek şuştin, gulavrêjî, kifnkirin, defnkirin û telqîn...) û di navbera sefera/jêhelbûna kesayetên dînî de jî diyar dibin. Lewra insanê ku li vê dinyayê misafir e (yanî hem mêvan e hem jî rêwîng e) gava dimirît, dikevîte nav seferêke metafîzîk û wisa diçîte alema miriyan. Lewra bedena wî/wê li vê alemê bimîne jî rûh difirît û diçîte alema dî. Loma ew jî jêhel diçît û mi’raca xwe pêk diînit. Ji ber wê jî rîtuêlên ku li pişt miriyan têtê kirin û yên mi’racê de wekhevî heye. Bo numûne Ardavîraf gava di atêşgedeya bi navê Azer Ferenbexê de xwe hazirê seferê dikir cilên temîz li xwe dikir, xwe dişuşt û li ser nivînen xwe xwe dirêj dikir û “baj” dixwend. Bi muqabilê van rîtuêlan, ehkamê cenazeyan di dînê Islamê de jî rîtuêlên nêzikhev in ku li ber sekeratê li ser nexweşî yan jî li ser mirî “Yasîn” têtê xwendin û mirî têtê şuştin û kifnkirin. Wekî ku Abdurrahîm Zapsu dibêjit “Li hember bûyera “mirin”ê di hemû dînan de hin merasim hene ku mirî bi wan têtê “techîz” û “tefkîn”kirin (Zapsu 1985: 5).” Yanî mirin, jêhelbûn û mi’rac li ser heman zemînê digehine hev. Bi vî şiklî mirin û baweriyên li dor wê, di edebiyat, teolojî û mîtolojiyê de hizreke kolektîf pêktînin.

6. ÇAVKANÎ

- Açıkgenç, A. (1995). “el-Esfârü'l-Erbaa.” *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*. 11: 374-376.
- Babacan Bursalı, M. (2018). “Cümcüme Sultan Hikâyesi'nin Kökeni Üzerine Bir Giriş Denemesi ve Anlatının Mensur Bir Yeniden Yazım Örneği.” *Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi*. (58). 2: 247-280.
- Batuk, C. (2001). “Ortadoğu Dinlerinde Eskatoloji Mitosları.” Samsun: Ondokuz Mayıs Ün.v., Sosyal Bil. Enst. (Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî).
- Celebi, İ. (2019). “Tezkiretü'l-Kurtubî.” *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*. Ek-2: 595-596.
- Çiftoğlu Çabuk, A. (2018). “Cümcüme Sultan Hikâyesinin İlk Mensur Türkçe Çevirisi.” *İdil*. (7) 48: 897-908.
- Çığ, M. İ. (2005). *Kur'an, İncil ve Tevrat'ın Sumer'deki Kökeni*. (çapa gemîn). İstanbul: Kaynak.
- Cotkar. (1988). “Efsana Cimcimê Sultan.” *Rewşen*. 1: 56-58.
- Dante Alighieri. (2020). *İlahî Komedyâ*. (Wer.: Sevinç Elpida Kara & Seçkin Erdi). İstanbul: Alfa.
- Dastanî Sultan Cumcume*. (2014). (Amd.: Muhemmed Reşîdê Emînê Paweyî, Karwan Osman Xeyat (Rêbîn)). Silêmanî: Înstîtuyî Keleporî Kurdî-Silêmanî.
- Dêreşî, S. (2005). *Kelhên Ava*. Duhok: Spîrez. [neql ji Şêlazî 2010].
- Eliade, M. (2003). *Dinler Tarihine Giriş*. İstanbul: Kabalıcı Yayınları. [neql ji: Özbek Arslan 2019].
- Erdi, S. (2020). “Ölmeden Önce Ölmenin ve Yeniden Doğmanın Yolculuğu: Dante'nin *Komedyâ'sı*.” 5-21. [di nav: Dante Alighieri 2020].
- Ergin, R. (2011). “Süryani Dîsel İşaretlerle Yazılmış Kürtçe İlahiler (Lawij-Gerşuni) Kürt Mesihiler Ya Da Midyath Kürtçe Konuşan Mesihiler; Süryani Dîsel İşaretli Kürtçe İki İlahinin Teolojik ve Dilbilimsel İçeriği.” *Uluslararası Midyat Sempozyumu*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi. 417-445.
- Feqe Reşîd. (2020). *Sirru'l-Mehşer*. (Amd.: Ahmet Gemi, M. Nazif Katılmış). Wan: Peywend.
- Feqe Reşîdê Koçer. (2002). *Sirru Mehşer*. (Tîpguhêzî: Osman Akdağ, Kerem Soylu). İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Feqî Reşîdê Koçer. (2014). *Sirul Mehşer*. (Amd.: Rênas Jîyan). Amed: Weşanxaneyê Belkî. [neql ji Feqe Reşîd 2020].
- Gemi, A. (2018). “Çend Agahî Derheq Jiyana Feqe Reşîd û Sirru'l-Mehşera Wî de.” *Nûbihar Akademî*. (3) 9: 117-130.
- Gennep, A. Van. (1906). *Mythes et Légendes d'Australie*. Paris: E. Guilmoto. [neql ji: Özbek Arslan 2019].
- Gilgamiş Destanî*. (1973). (Wergêrana bo Ingilîzî: N. K. Sandars). (Wergêrana ji Ingilîzî bo Tirkî: Sevin Kutlu & Teoman Duralı). İstanbul: Hürriyet.
- Gilgamiş Destanî*. (1998). (Wer.: Muzaffer Ramazanoğlu). Cumhuriyet.
- Hall, M. P. (2017). *Mısır'da Ruh ve Ölüm Ötesi*. (wer.: Ozan Can Hacıoğlu). İstanbul: Hermes.
- Harman, Ö. F. (2013). “Ya'kûb.” *Diyanet İslam Ansiklopedisi*. 43: 274-276.
- Heft Kitab*. (1346-q). (Naşir: Mîrza Nesrullah Mihrkhan).
- Mela Hisênê Bateyî. (2003). *Mewludul-Nebî*. İstanbul: Nûbihar.
- Mela Mesîhayê Tirwanşî. (1996). “Beyta Qiyametê.” *Vejin*. 3: 91-108. [neql ji: Mela Mesîhayê Tirwanşî 2010].
- Mela Xelîlê Sêrtî. (2002). *Nehcul Enam*. (Tîpguhêzî: Osman Akdağ, Kerem Soylu). İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

- Mela Yasîn Yusrî. (2011). *Baxçeyê Jiyanê Piştî Mirinê*. (Amd.: Muhammed Topraq). İstanbul: Nûbihar.
- Özbek Arslan, N. (2019). “Ardavirafnâme ve Miraçnâmelerde Yükseliş Mitinin İncelenmesi.” *Akademik Dil ve Edebiyat Dergisi*. (3) 4: 420-446.
- Prim, E. & Socin, A. (1988). “Cimcima Sultan.” *Rewşen*. 1: 59-60.
- Sandars, N. K. (1973). “Giriş.” 7-62. [di nav: *Gılgamış Destanı* 1973].
- Sayın, Z. (2018). *Ölüm Terbiyesi*. İstanbul: Metis.
- Şêlazî, C. M. (2001). “Beyta Sekeratê.” *Vejn*. jimar: 22. [neql ji Şêlazî 2010].
- Şêlazî, C. M. (Berhevkar). (2010). *Hindek Beytên Kurdî Ji Destnivîsên Mela Mistefa Oremarî (1920-1994)*. Duhok: Çapxana Hawar.
- Şêx Evdirrehmanê Axtepî. (1991). *Rewd[un]Neim*. (Amd.: Zeynelabidin Zinar). Stockholm: Yekîtiya Nivîskarên Kurd.
- Şêx Nûreddînê Birifkanî. (2001). *Zibanê Kurdî: Dîwana Şêx Nûreddînê Birifkanî*. (Amd.: Zahid Birifkanî). Stockholm: Weşanên Roja Nû.
- Şêx Nûreddînê Birifkanî. (2002). *Zebanê Kurdî: Dîwana Şêx Nûreddînê Birifkanî*. (Amd.: Zahid Birifkanî). Hewlêr: Aras.
- Tek, A. (2019). “Kolektif Bellekte Kırılma ve Yeniden İnşa Olarak Kerbela Yası.” *Monograf*. 11: 10-39.
- Utas, B. (1377). “Sefer be Cihan-i Dîger, der Surayîş-i Kuhen-i Parsî. *Îranşinasî*. (wer: Daryuş-i Karger). (10) hî: 38: 311-324.
- Uzun, M. (2005). “Mi’raciyye.” *Diyanet İslam Ansiklopedisi*. 30: 135-140.
- Yavuz, S. S. (2005). “Mi’rac.” *Diyanet İslam Ansiklopedisi*. 30: 132-135.
- Yıldırım, N. (Wer.). (2019). *Ardâvirafnâme: Cennet, Araf ve Cehennem*. İstanbul: Pinhan.
- Zapsu, A. (1985). *Cenaze ve Temizlik Ahkâmı*. İstanbul: Ehl-i Sünnet.

ÇAVKANIYÊN DÎJÎTAL:

- Bible*. “Genesis”: <https://www.biblegateway.com/passage/?search=Genesis%2028&version=NIV> (tarîxa gehandinê: 02.12.2021).
- Evdiselamê Xalidî Zîbarî. (2011). “Beyta Olî [Qiyametê].” (Tîpguhastin: Cankurd). *Kurdax*: <https://cankurd.wordpress.com/2011/02/24/beyta-oli/> (tarîxa gehandinê: 15.10.2021).
- Îsîs û Horus. Harvard Art Museums. <https://hvr.art/0/303606> (tarîxa gehandinê: 15.10.2021).
- Jacob's Ladder*. (1490). by French School. Musee du Petit Palais. Avignon, France: <https://biblicalisrael-tours.com/2016/12/jacobs-ladder/> (tarîxa gehandinê: 15.10.2021).
- Mela Mesîhayê Tirwanşî. (2010). “Beyta Qiyametê. <https://cankurd.wordpress.com/2010/08/30/mela-mesihaye-tirwansi-beyta-qiyamete-1/> (tarîxa gehandinê: 15.10.2021).

Extended Abstract

The idea of death and the end of life in this world, on the one hand, has become a subject of curiosity for people, and on the other hand, a motivation for creation another world. This was formed through collective myths, in which people either wrote literally texts or revealed metaphysical journeys within religious systems. For example, from the epic of Gilgamesh to Cimecime Sultan, the story of Ardavîraf to the ascension of Jacob, Jesus, and Mohammed, all have been parts of the same journey. Likewise, *The Divine Comedy* of Dante, Mela Xelîl's *Nehcul-Enam*, Şêx Ebdurrehman Aqtepî's *Rewdun-Neîm* and Feqe Reşîd's *Sirrul-Mahşer* deal with the same journey.

However, what these text show us is not limited to merely sharing the same journey. The idea of death and the understandings that develop around it are also shared from the same root. Since death is a bridge that goes to another realm with no return, these texts and myths written on cosmogony and eschatology are also bridges through which they establish a connection in our world of thoughts. In this wise, the burden of the understanding the other world and of the enigma of the death become lighter.

The texts mentioned in this study are either eschatological texts that deal with the end of the world or they are religious texts that are written about the mortality of this world and the reality of the next world, that is, the hereafter. That is why common themes such as Doomsday, End Times, Heaven and Hell appear in these texts. On the other hand, the common sharing established with myths, metaphors, and rituals creates a connection to view these themes through a spectrum. Thus, as seen in this study, the ritual and mythological roots of death and the imagination of afterlife have grown from collective memory. That is because the comparison of eschatological texts studying the phenomena of the apocalypse and the realm of death allows both comparing and understanding of these important matters.

An extensive literature has emerged in the world literature on death and the afterlife. Many literary texts have been written in theological/eschatological framework. Especially the theological texts depicting Heaven and Hell, as well as epics and stories about metaphysical journeys are noteworthy. In this study, besides such works, some examples of Kurdish texts are also presented. In order to understand these texts, initially some important examples are introduced. In Kurdish texts, the examples on death and the texts on journey to afterlife, such as ascension are to be analyzed on a comparative scale. Hence, in this work, the introducing a new version of Beyta Sekerat was made in order such analysis to be conducted.

PÊVEK

BEYTA SEKERATÊ

Subhan ji te şahê Kerîm⁴
Tu[y] xaliqê 'erşê 'ezîm
Bexşîn ji te tê ya Rehîm⁵
Estexfîrullahul-'ezîm

Tu hakimê 'eresatê
Dê keyn behsê sekeratê
Me xilas ke j' muhlikatê
Estexfîrullahul-'ezîm

Eya 'ebdê gunehkar e
Bo çî nakey îstixfar e!
Neku bimrî şermizar e
Estexfîrullahul-'ezîm

Tu bo çî wey îmansist î
Tu dînê xwe naperistî
'Umur raborî ji destî
Estexfîrullahul-'ezîm

Heta kengê dê xafil bî!
J'ber guneha tarî-dîl bî!
Tu tewbe [ke] da 'adil bî
Estexfîrullahul-'ezîm

Tu bes bike gunehan e⁶
Ku 'aqîbet qebriştan e
Tu dê bibî peşêman e
Estexfîrullahul-'ezîm

Hindî xoş î b'rûh û giyan î⁷
Li xwe bigre wî ezmani⁸
Bîr xwe bîne qebriştanê!
Estexfîrullahul-'ezîm

Qencyê bike li ser dunyayê⁹
Xwe hişyar ke ji vê xewxayê
'Umur ku çû paşve nayê
Estexfîrullahul-'ezîm

Ecel ku hat nagehanî
Rizq tê birîn ji 'esmani¹⁰
Fayde naket peşêmani
Estexfîrullahul-'ezîm

Ey Xaliqê 'erş û felek
Ey xudanê mulk û melek
Min kirîne guneh gelek
Estexfîrullahul-'ezîm

Tu[y] wahid î yek î b'tinê¹¹
Te em dane ji bo mirinê¹²
Em dê çî [keyn] ji malê dinê
Estexfîrullahul-'ezîm

Ya Ilahî tu Sebûr î¹³
Bê'emel î tu Xefûr î
Bê[ta'et] î tu Şekûr î
Estexfîrullahul-'ezîm

Zenb û xeta her ji me tîn¹⁴
Rehm û 'eta her ji te tîn
Hîvîdarê selamet î¹⁵
Estexfîrullahul-'ezîm

Hîvîdar î recewkar e
Weku têtin emrê Cebbar e
Me nehêlît li şunwar e
Estexfîrullahul-'ezîm

Penahê min Rebbê feleq
Ji mekrê şerê 'ema xeleq
Şermê nekeyn roja xeleq
Estexfîrullahul-'ezîm

Navê te navek laîq e
Qewlê te daîm sadiq e
Min bawer e ew Xaliq e
Estexfîrullahul-'ezîm

Ey 'elîmê sîrr û 'elan
Ey hekimê derd û belan
Ey xudanê bang û selan
Estexfîrullahul-'ezîm

Heta kengê dê xafil bîn!
Lazim ku dê her bimirîn
Sefer dê keyn mala gedîn
Estexfîrullahul-'ezîm

Ey xafirê zenb û xeta¹⁶
Ey qadirê fezl û 'eta¹⁷
Xas[ê] te ye sîtr û 'eta
Estexfîrullahul-'ezîm

Çî zehmet e çî cefa ye
Ew derdekî bê dewa ye
Bêhin girt bêhin hilmaye!
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew derdekî bê derman e
Ew rûha wî şîrîn can e
Ew teqdîra yê Rehman e
Estexfîrullahul-'ezîm

Roja ku têtin ecêlê me¹⁸
Tu li me negre 'emelê me¹⁹
Ihsan bike rehmê li me
Estexfîrullahul-'ezîm

Heçî 'ebdê gunehkar e
Eger ne te bît pê Xefar e!²⁰
Kî dê bêt di bang û hewar e!²¹
Estexfîrullahul-'ezîm

Heçî 'ebdê ku 'asî ye
Ber dergahê te hatiye
Mefer tu yî kes dî niye
Estexfîrullahul-'ezîm

4 - ji te: ji

5 - tê: têt

6 - Ev bende di Oremarî de kêm hatîye.

7 - xoş î: bi xoş î; giyan î: can î

8 - bigre: bigrin; bîne: bînin.

9 - bike li ser: biken ser; ke: ken

10 - Tê birîn: dê biriyêt

11 - Tu[y] wahid î: Ey wahidê

12 - dane: dayne

13 - Tu: tu yî (di rêzên din yên vê çarînê de jî herwisa).

14 - Tîn: têt

15 - Hîvîdarê selamet î: Hîvîdar î ji selametê

16 - Ey xafirê: Ey xafilî jî...

17 - Qadirê: qabilê

18 - ku: -

19 - li me negre 'emelê: me negre bi 'emelêt

20 - eger ne te bît pê: ger nebêt ya

21 - di: -

Bo miskînan mefer tu yî
Muhtacîyan melce tu yî
Der-dubanan merce' tu yî
Estexfîrullahul-'ezîm

Tu paşayê 'ezemetê²²
Xezeb heyê digel rehmetê²³
Rehmê bike wê sa'etê²⁴
Estexfîrullahul-'ezîm

Ilahî tu êk î bi tinê²⁵
Te em dayne ji bo mirinê
Bêîman neçîn ji vê dinê²⁶
Estexfîrullahul-'ezîm

Hînê ku têt hewar e!²⁷
Emrê mezin têtê xwar e
Min nekiryê kar û bar e²⁸
Estexfîrullahul-'ezîm

Min nekiryê karê sefer
Tu li me bike rehîm û nezer²⁹
Îmanê ji me neke veder³⁰
Estexfîrullahul-'ezîm

Ez lew dikem vê gotinê
Zêde ku halê mirinê³¹
'Ibret biken qebrê bi tinê!
Estexfîrullahul-'ezîm

Qebrê bi tinê çî 'ibret e!³²
Rûhkêşan çend bi zehmet e!³³
Ew her wekî qiyamet e!³⁴
Estexfîrullahul-'ezîm

Ecel ku hat dimirîte³⁵
Hal û ehwal dê çî bîte!³⁶
Qiyamet dê li me rabîte!³⁷
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew mecalê ku têt ecel
Reng û suret dibin têkel³⁸
Jêk radibin geh û wesel
Estexfîrullahul-'ezîm

Bi fermana şahê celîl
Tên çar melek zûy bi te'cîl
Ji bo rûha 'ebdê zelîl
Estexfîrullahul-'ezîm

Du li ser destan du li ser piyan³⁹
Çi nesaxekî herîşyan!⁴⁰
Rûhê dikêşin ji hestîyan⁴¹
Estexfîrullahul-'ezîm

Du li ser destan du li ser ran e
Çi nexoşekî giran e⁴²
Rûhê dikêşin ji rehan e⁴³
Estexfîrullahul-'ezîm

Heta îna cerg û hinav⁴⁴
Pêda diçin av û xunav⁴⁵
Qet lê nema reng û bizav⁴⁶
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew dizanît zehmet çend e
Çi nexweş e derdumend e
Jêk radibin hestî û bend e
Estexfîrullahul-'ezîm

Wekî dilê wî dikêşin⁴⁷
Cerg û hinav lê diherîşin
Fîkr û xiyal lê dipelixin⁴⁸
Estexfîrullahul-'ezîm

Ey hewar e sed hewar e!
Ev nexweşek birîndar e
Ne mefer e ne qerar e!
Estexfîrullahul-'ezîm

Ji zehmetê dilgîr dibît!⁴⁹
Reng û rûbar lê zer dibît⁵⁰
Rondik ji çava der dibît⁵¹
Estexfîrullahul-'ezîm

Çi zehmet e çî cefa ye!
Çi bêhtengî bêdewa ye!⁵²
Ew derdekî bêderman e⁵³
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew derdekî bêderman e
Ew rûha şîrîn cih mekan e⁵⁴
Ew teqdîra yê Rehman e
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew teqdîra yê Miluk e
Dilê ze'îf çend xiduk e⁵⁵
Ew rûh qet lê naçît zûke⁵⁶
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew derdekî bêbetîb e
Ew qalibê rûh qerîb e
Nalên jê diçin yî xerîb e⁵⁷
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew qalibê rûh cesud e
Çend nexweş e çend zecur e
Dinalêtin ji dilê kûr e!
Estexfîrullahul-'ezîm

Dil û mêlak herdu êk in
Di me'dî da herdu ji êk in
Li rûhkêşanê ewku êk in
Estexfîrullahul-'ezîm

Dil lê gelek bi kovan e
Eger lê hebît ezman e
Gazî jê diçît ber 'esman e
Estexfîrullahul-'ezîm

22 - paşayê: padişahê
23 - rehmetê: zehmetê
24 - bike wê: sebeqê vê
25 - Ilahî tu êk î: tuy wahidê yek
26 - neçîn: nebîn
27 - hînê ku têt: hîna ku dê bêt
28 - nekiryê: nekîr
29 - nezer: xefer
30 - neke: nekeye
31 - zêde ku: ji reng û
32 - qebrê: 'emrê
33 - bi: pîr
34 - wekî: wek
35 - dimirîte: dê mirîtin
36 - çî bîte: bîntîn
37 - rabîte: rabîtin

38 - dibin: dê bît
39 - Di versiyona Oremarî de "piyan"
û "destan" cih guhoriîne.
40 - herîşyan: reng sermestan
41 - ji hestîyan: li bin hungistan
42 - nexoşekî: nexoş e zor
43 - rehan e: bin tîlyan e
44 - heta îna: hîna ku înan
45 - Pêda diçin av û xunav: Dê kevin
'ereq û xunav
46 - Qet lê nema reng û bizav: Li wî
neman reng bizav
47 - dikêşin: digivêşin
48 - dipelixin: dişewîşin

49 - dilgîr dibît: dil ketibît (di ya
Birifkanî da: "ker dibît").
50 - Reng û rûbar lê zer: Reng pêt û
kep xav
51 - çav: çavan (cihê vê rêzê û ya be-
riya wê di herdu versiyonan de
lêkguhoriye).
52 - Çi bêhtengî bêdewa ye: Bêhn
girtîye bêhn helmaye
53 - bêderman e: bêdewa ye. (ev rêz û
ya beriya wê lêkguhoriye)
54 - şîrîn cih mekan e: wî şîrîn can e
55 - çend: çî
56 - Ew rûh qet lê naçît zûke: Qet lê
nabît sivik e
57 - Nalên jê diçin yî xerîb e: Nabît ji
tên ew hebît e

Çi 'ebdekî bêawaz e
Nesaxekî bêdaxwaz e
Çavan diket ser evraz e⁵⁸
Estexfîrullahul-'ezîm

Rûh ji dilî farix bûye⁵⁹
Di singî da daxil bûye
Mefer Allah kes dî niye
Estexfîrullahul-'ezîm

Mefer Allah, çi xewxa ye!⁶⁰
Rûh ji dilî bû cuda ye
Di singî da bû cema ye
Estexfîrullahul-'ezîm

Rûh helperî ji dest û mila
Ji ber jana cerg û dila!⁶¹
Di singî da rûh da mila⁶²
Estexfîrullahul-'ezîm

Rûh ji singî ku helperî
Di halê xwe da maye heyrfî
Hûrik hûrik ew fikirî
Estexfîrullahul-'ezîm

Herdu çavan rik diket
Çi xewxa ye çi heybet e
Rast e mirin qiyamet e
Estexfîrullahul-'ezîm

Çi halekî cefakêş e
Çi bi zehmet e jan û êş e
Seyê le'în tete pêş e
Estexfîrullahul-'ezîm

Çi halekî nexweşkar e
Çi bêhteng e çi dijar e
Çi dilsoj e çi bêmar e⁶³
Estexfîrullahul-'ezîm

Bê taqet bê mal û hal
Xêr û şer hemî tene bal
Şeytan tînit ava zelal
Estexfîrullahul-'ezîm

Têne nik melekê sewabê
Hem tene nik melekê 'ezabê
Ew jî digel diken hesabê
Estexfîrullahul-'ezîm

58 - ser evraz: serfiraz

59 - farix: xaliq

60 - Mefer Allah: Çi heybet e

61 - Ji ber jana: Jêra îna

62 - da mila: weslan

63 - bêmar: dijar

Ew şeytanê bi le'net e
Hindî ku tete derfet e
Şerbkê avê dê bidete
Estexfîrullahul-'ezîm

Jar û 'ebdê sergirano
Dujmin hemî lê cemyano
Mefer ilahê Rehmano
Estexfîrullahul-'ezîm

Şeytan dibê 'ebdo bike
Her çi bêjim tu her we ke
Tu vê avê lêva xwe ke
Estexfîrullahul-'ezîm

Dibêjîtê el-xennas e
Bawer bike min binase
Ji wê zehmetê bî xilas e
Estexfîrullahul-'ezîm

Eya 'ebdê ketye davê!
Dê tu vexo camek avê
Dê rihet bî her vê gavê
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew derdekî bê dewa ye
Avê vexo, bît derman e
Ji vê 'illetê bî 'efa ye!
Estexfîrullahul-'ezîm

We dibêjît yê le'în e
Avê vexo çend şîrîn e
Belê îmanê bi min bîne!
Estexfîrullahul-'ezîm

Ji teqdîra llahî
Eger avê newergirî
Ji îmanê nabî berî
Estexfîrullahul-'ezîm

Eger teqdîr bû beyan e
Avê vextot yê bêgan e
Dê jê xilas bît îman e
Estexfîrullahul-'ezîm

Iblîs ji nik radibît
Rûh li kurî reng reng dibît
Hindî weku bêhteng dibît
Estexfîrullahul-'ezîm

Rûh ji bedenê cuda bûye
Di singî da hat û çûye
Ji bêhtengî hiltavê e
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew melekê berahiyê⁶⁴
Rûh kêşa heta gewriyê⁶⁵
Dihêlîtin ji bo dûmahiyê⁶⁶
Estexfîrullahul-'ezîm

Her nefesek dimînitîn⁶⁷
'Ezraîl zû dilezînitîn
Rûhê ji gewriyê dibizdînitîn⁶⁸
Estexfîrullahul-'ezîm

Bi fermana yê evraz e
Qalib dimînitî bêawaz e
Çavan diket ser evraz e
Estexfîrullahul-'ezîm

Rûh ji bedenê bû tevav e⁶⁹
Disekinît li hindav e⁷⁰
Lê rik dibin herdu çav e
Estexfîrullahul-'ezîm

Rûh di qalib diperîte⁷¹
Qalib li rûhê heltête⁷²
Herduwan qewî yêk divête⁷³
Estexfîrullahul-'ezîm

Herdu di têk difikurin
Di aciz in teheyûr in
Bi halê yekûdu fikirin
Estexfîrullahul-'ezîm

Qalib dibêt ya rûhayê
Xweziya ser dunyayê⁷⁴
Peşemanî bi kêr me nayê
Estexfîrullahul-'ezîm

64 - Melikê: melekê

65 - Rûh kêşa: Ew kêşan

66 - Dihêlîtin ji bo: Dê hêlin bo

67 - Her nefesek dimînitîn: Her 'ezabê da ditînitîn

68 - dibizdînitîn: dihilînitîn

69 - Rûh ji bedenê bû: Rûha Xaliq ji boyî

70 - Disekinît: Di singî da ma

71 - di qalib diperîte: ji qalibî difirîte

72 - li: bi

73 - yêk: êkûdu

74 - Xweziya ser: Xoziya wek li ser

[Hindî bi xoşî û nehişyar î⁷⁵
Weku dimirîn di hişyar î
Peşêmanî û şermizar î
Estexfîrullahul-'ezîm]

Ew qalibê bêdeng û jar e
Da bo bikeyn kar û bar e
Ew mêhvanê yê Cebbar e
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew mêhvan e seferî ye⁷⁶
Mal û 'eyal hêlayî ye
Dê çîte mala ebedî ye⁷⁷
Estexfîrullahul-'ezîm

Xessal gava ku têtê nik⁷⁸
Cilan ji ber diket sivik⁷⁹
Gazî diket wan sivik⁸⁰
Estexfîrullahul-'ezîm

Ey xessalo tu bi Xudê key
Bî rehî û şefqet min çêkey
Avê nerm li min bikey!
Estexfîrullahul-'ezîm

Feqîrêkî miskîn [û] jar im!
Dilsojekî birîndar im
Evro qewî ez bê[ç]ar im
Estexfîrullahul-'ezîm

Ya xessalo qewî xêr e
Tu ji îro hatiye êre⁸¹
Hêdî hêdî min wergêre
Estexfîrullahul-'ezîm

Nekey li min zehmetdanê
Birîndar im ji êşanê
Ji 'Ezraîl û rûhkêşanê⁸²
Estexfîrullahul-'ezîm

Ya xessalo nelezîne⁸³
Ew qalib derd û birîn e⁸⁴
Kifnî li çava neşidîne⁸⁵
Estexfîrullahul-'ezîm

Tu her wekî bab û kuran
Li min veşêre 'eyb û sûran
Şermê dikem ji yar û biran⁸⁶
Estexfîrullahul-'ezîm

Wekî kifnî têwer diken⁸⁷
Ser û çavan sitar diken
Carek d[î] hewar diken
Estexfîrullahul-'ezîm

Her gaziyekê [hayjê dibît]
Şerq û xerban guhlê dibît⁸⁸
Ins û cina guh lê nabît⁸⁹
Estexfîrullahul-'ezîm

Ya [xessalo] tu bike minnetê⁹⁰
Çava negrî wê sa'etê⁹¹
Da bibînim vî kulfetê⁹²
Estexfîrullahul-'ezîm

Sefera min qewî dûr e
'Eyalê min gelek hûr e
Da jê bixwazim destûr e
Estexfîrullahul-'ezîm

Da bibînim wê sa'etê⁹³
Jê bixwazim ez hîmmetê⁹⁴
Dûr e roja qiyametê
Estexfîrullahul-'ezîm

Gava dana nav du daran
Gazî diket xi[z]m û yaran
Min sefer e li çar dîwaran
Estexfîrullahul-'ezîm

Wekî li daran kir suwar e
Gazî diket bang û hewar e
Çûme mala darqîrar e
Estexfîrullahul-'ezîm

Çûme mala ax û gilîn⁹⁵
Li xwo fikrîn ya xasirîn!
'Tbret biken ya xafilîn!
Estexfîrullahul-'ezîm

Vê dunyayê ez revandim
Heta mirnê ra gehandim⁹⁶
Seyê le'în ez xirandim⁹⁷
Estexfîrullahul-'ezîm

Jaro 'ebdê sergiran e⁹⁸
Malxirab e peşêman e
Çû bo mala tarîstan e
Estexfîrullahul-'ezîm

Çu maleka nexweş-kar e⁹⁹
Çi qebrekî dikan-sar e!¹⁰⁰
Tijî kirm û mişk û mar e
Estexfîrullahul-'ezîm

Tijî mar û mişk û mur e
Çar dîwar e qewî kûr e!
Qiyamet hêj gelek dûr e
Estexfîrullahul-'ezîm

Qewî kûr e gelek teng e¹⁰¹
Tarî û reş dûre-deng e!¹⁰²
Heq dizanît ew çî reng e!
Estexfîrullahul-'ezîm

Çi halekî bêmefer e
Rajêra wî toz û ger e
Balîfka wî hişke-ber e!
Estexfîrullahul-'ezîm

Marê semum her digezît!
Ji heybetê her dilerzît
Çu rê nîne pêve bezît!¹⁰³
Estexfîrullahul-'ezîm

'Ebdê sefer kir ji dinê
Dî qebrî da mabû bi tinê!
Vêca halê xwe da bi tinê
Estexfîrullahul-'ezîm

Çi maleka dikan-qebr e
Bê'emel û zad û debr e
Hawar, naêt li min sebr e!
Estexfîrullahul-'ezîm

75 - Ev çarîne me ji versiyona Oremarî ya standî...

76 - mêhvan e seferî: mêhvanê seferê

77 - Çûbû mala qed nedîye

78 - gava ku: weku ew

79 - sivik: nazik

80 - wan sivik: sivik sivik

81 - jî îro hatiye êre: zû evro hatye hêre

82 - Ji: Ji ber

83 - nelezîne: melezîne

84 - Ew qalib: Qalib bi

85 - li çava: li min

86 - yar û biran: bab û bir

87 - têwer: derwar

88 - guhlê dibît: bilind bît [bilin-d-ibît]

89 - guh lê: gulê

90 - tu bike: ez dikem

91 - negrî wê: negre vê

92 - Da bibînim vî kulfetê: Wextê gorê vê kulfetê

93 - wê: vê

94 - hîmmetê: mohletê

95 - Ev rêze di varyanta Oremarî de nehatiye.

96 - Heta mirnê ra gehandim: Vê mirinê ez gehandim

97 - Seyê le'în ez xirandim: Vî le'înî ez xarandim

98 - Jaro 'ebdê sergiran e: Ew 'ebdê wek sergerdan e

99 - Çu maleka: Çûme mala

100 - dikan-sar: mekan-sar

101 - Qewî: Gelek

102 - Tarî û reş dûre-deng e: Pur 'ezab e deng-deng e

103 - Çu rê nîne pêve bezît: Çav dimînit pêve dibezît

Bi fermana Şahê 'Izzet
Tên du melek yê bi şiddet
Li bin 'erdî bi heybet!
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew tèn wekî bi hawar e
Li bin 'erdî qareqar e
Bi heybet û bi dijwar e
Estexfîrullahul-'ezîm

Hawar diken bêfesalet e
Gurzê agirî wê li bal e
Ji dixwazin çend sual e
Estexfîrullahul-'ezîm

Tên du melek di kebîr e
Bi heybet û zemherîr e
Yek Munker û yek Nekîr e
Estexfîrullahul-'ezîm

Bi heybet û sûret-reş in
Zebanî ne çav di şîn in
Zebanî Munker Nekîr in
Estexfîrullahul-'ezîm

Zebanî ne yê Munker e
Her bi toz û ax û ger e
Li bin qebrî tene der e
Estexfîrullahul-'ezîm

Rûha xaricbûyî tevay e
Li qalibî dibît belav e
Wekî vediket herdu çav e
Estexfîrullahul-'ezîm

Hişyar dibin di derhal e
Guh li dengê qîlûqal e
Hawara me Zul-celal e
Estexfîrullahul-'ezîm

Hawar ew qebristan e
Çi tarî ye tarîstan e!
Hatîne nik du mêhvan e
Estexfîrullahul-'ezîm

Zebanî tèn vê sa'etê
Li bin qebrî ji xefletê
Li 'ebdî dixwazin bi heybetê
Estexfîrullahul-'ezîm

Eya 'ebdo rastî bibê
Rebb û nebiyê xwe bibê
Dîn û îman safî bibê
Estexfîrullahul-'ezîm

Qubleta xwe bike beyan
Bo me bêje xûşk û biran
Fesîh bêje wan hemiyan
Estexfîrullahul-'ezîm

Ew dibêt Ellah rebbê min e
Û Muhammed nebyê min e
Dînê Îslam dînê min e
Estexfîrullahul-'ezîm

Îmana min kelamullah
Qibleya min Ke'betullah
Eşhedu ella ilahe illellah
Eşhedu enne Muhammeden-
Resûlullah

Ferman diket yê Xaliq e
Rastî got 'ebdê sadiq e
Xoş bi gul û qenc laiq e
Estexfîrullahul-'ezîm

Ya melek xil'et bike
Mêhvanê min 'izzet bike
Bi sed caran hurmet bike
Estexfîrullahul-'ezîm

Mêhvanê min têrxan bike
Qebrê wî pîr ihsan bike
Xoş bi gul û rûhan bike
Estexfîrullahul-'ezîm

Misk û 'umber [û] bixur bike
Bêhnxwoş û rûhan bike
Qebrê wî tijî nûr bike
Estexfîrullahul-'ezîm

Qebrê wî şîrîn bike
Malê gele[k] nûrîn bike
Kifnê cangî rengîn bike
Estexfîrullahul-'ezîm

Rengîn bike lê dîwaran
Hivz bike ji mişk û maran
Fireh biken çar dîwaran
Estexfîrullahul-'ezîm

'Ebdê min şermoke ye
Hurmetkerê baxê xwe ye
Evro ihsankerê me ye
Estexfîrullahul-'ezîm

Îro ez dê kem minnetê
Li qebrî vekeyn dergehêkî
Da bibinî cihê xwe li Cennetê
Estexfîrullahul-'ezîm

Heta bikeyn beyan e
Cihê wî bikeyn 'eyan e
Ji fezlê bimînît heyran e
Estexfîrullahul-'ezîm

Ez ku dikem wê himmetê
Muqabilî wê xizmetê
Binve heta qiyametê
Estexfîrullahul-'ezîm

'Ebdê zanî wê sa'etê
Cihê xwe li Cennetê
Pisyar diket ji qiyametê
Estexfîrullahul-'ezîm

Heçî xalî ji tewbetê
Teheyyur e ji heybetê
Nuzanî cewabê bidetê
Estexfîrullahul-'ezîm

Nuzanî dê çî bêjîtin
Ezman ku lê dadkevîtin
Qebir li wî tarî dibîtin
Estexfîrullahul-'ezîm

Herçî 'ebdê me' siyyet e
Ji guneha ne tewbet e
Nuzenî cewabê bidet e
Estexfîrullahul-'ezîm

'Ebdê bîmrît bê tewbet e
Gunekarê baxê xwe ye
Şermizarê Rebbê xwe ye
Estexfîrullahul-'ezîm

'Ebdê minê bêtewbe ye
Gunehkarê baxê xwe ye
Evro 'ezaba Kerîm e
Estexfîrullahul-'ezîm

Ya xafilî[n] guh bidêrîn
Hûn dê mirin ku tê mirin
Dê li ber 'eyban xwe veşêrin
Estexfîrullahul-'ezîm

Xwudan rojî û nivêjtir e
Heçî ji dil tewbekir e
Li axretê rûy-spîtir e
Estexfîrullahul-'ezîm

Rojî nêvêj fitre zikat
Heçiyê ji malî cuda biket
Lazim ewan bi heq biket
Estexfîrullahul-'ezîm